# Methelokên Hezretê Silêman

Civata Kitêba Miqedes
ya yekbûyî

Bêrût
1949

# Metheloken Hezretê Silêman

Civata Kitêba Miqedes
ya yekbûyî

Bêrût
1949

هەواڵنامەی کتێب

Kurdish Proverbs - 3 M - 1949

Printed in Beirut - Lebanon

هەواڵنامەی کتێب

Civata Kitêba Miqedes ya Emerîkanî.
Civata Kitêba Miqedes ya britani û biyani

Bêrut - Qahire - Londre - Nû-York

# Methelokên Hezretê Silêman

Ev in methelokên Silêman, kurę Dawûd, qralê
Israilistanê.
2 Ji bona hînbûna sehrezayî û rêz û rêzikan û
ji bona sehkirina gotinên eqilmendiyê ;
3 Ji bona standina dersên çavvekirinê, pakdiliyê û
çeyî û rastdiliyê.
4 Da ko mirovên adetî bibin fêris û xort bibin
eqilmend û çavvekirî.
5 Bila eqilmend guh bide, pê zanîna wî dê bibe
bêtir û yê ko zêrek e pê bibe çêtir,
6 Da ko ew bikare bigehe mana sîretekê an ma-
mikekê û gotina bîreweran û axaftinên di wan
seh bike.
7 Tirsa Xwedê destpêka zanînê ye ; yên bêkêr qe-
drê bireweri û hînbûnê na girin.
8 Kurê min, bide pey rêz û rêzikên bavê xwe û
dev ji şîretên deya xwe bermede ;
9 Pêkanîna wan ji te re gewher û ji stoyê te re
gerdinîyek e.
10 Kurê min, çaxa ko gunehkar dikin te ji rê derî-
nin, guh me de wan.

11 Heke wan got: were bi me re, em ê bi qesda
kuştinê kemînekê deynin pêşîya xelkê, bi dizîka
bidin pey bêsûçan û dirêji wan bikin;
12 Bila, em mîna agirê dojehê ê xurt bi wan ke-
vin û weke gora ko miriyan daqurtîne wan da-
qurtînin;
13 Em dixwazin dest bavêjin talanine hêja û pê
malên xwe tejî bikin;
14 Bila, para te jî tê de hebe; ew talan wê bibe
ya me û ya te.
15 Kurê min, bi wan re bi rê me keve; lingê xwe
ji şîvereya wan bi şûnda bikişîne;
16 Ji ber ko reya wan digehe xirabiyê û qesda wan
a har rijandina xwîna bêçareyan e.
17 Bêfeyde ye avêtina torekê pêş çavên yên ko
xwedî per û bask in:
18 Ew, xwe bi xwe kemîna datînin pêşiya xwe û
çavnêriya rijandina xwîna xwe dikin.
19 Dawiya hemî mirovên çavbirçî ev e; çavtengî
xwediyê xwe winda dike.
20 Eqilmendî di nav kûçe û kolanan de ban dike,
û di gasinan de bi dengekî bilind dipeyive;
21 Di derîzana dergehê kelatan de, di nav komên
mirovan de gotina xwe dibêje; dengê xwe dide
bihistin;

22 Gelî bêhişan, heta kengê hon dikin bêhiş bimî
nin û dilê xwe bi henekan bi gotinine beredayî
şa bikin û heta kengê bodile nefiran li zanînê
bikin ?
23 Rûyê xwe bidin min û guh bidin şîretên ko ez
pê li we dişidînim ; ez pendên dil û canê xwe
li we belav dikim, ezê gotinên xwe ji we re bi-
dim seh kirin...
24 Lê, herwekî ez banî we dikim û hon guh na
dine min, û herwekî ez destê xwe didime we
û tu kes vî destî na gire ;
25 Ji ber ko hon şîretên min davêjin pişt guhê
xwe û hejî pendên min bi yên ko ez li we di-
şidînim na kin ;
26 Ez jî, dema ko hon ê bikevin helaketê, dê bi-
kenim ; ez ê henekê xwe bi we bînim, çaxa ko
tirs û tomet dora we, ê bigire ;
27 Dema ko tirs mîna bazorekî bihna we dê biçikî-
ne û kambaxî weke bablîsokekî dora we wê bi
gire û çaxa ko zarî û tengasî zora we dê bibe.
28 Hingê, ew ê banî min bikin lê ez li wan vena-
gerînim ; ew ê li min bigerin lê min peyda na
kin.
29 Ji ber ko wan guh ne didan pend û şiretan û ne
dixwestin tirsiyarê Xudayê xwe bibin ;

30 Ji ber ko wan hejî siretên min ne dikirin û
bi cezayên ko min pêş wan dikir henekê xwe
dianîn,
31 Bila niho fêkiyên emelê xwe bixwin, û bi şiretên
xwe ên kirêt têr bibin.
32 Serhişkiya bodileyan wan dikuje û xweşiya eh-
meqan wan winda dike;
33 Lê, yê ko guh dide m'n, bi rahetî wê pal bide,
di xweşiyê de rojên ywe derbas bike û tirs na
keve dilê wî.

## Bir 2

Kurê min, heke te guh da gotinên min û bi ya
pendên min kir,
2 Bi awakî ko bala xwe didî hikmet û sehrezayi-
-yê û dilê te bi xeyret û germî bi zêrekiyê ben-
dewar dibe,
3 Belê, heke tu banî hikmet û şehrezayiyê dikî
û heke dengê te ber bi zêrekiyê ve bilind dibe,
4 Heke mîna yên ko li peran digerin, tu li wê
digerî û mîna xezîneyekê qedrê wê digirî û di-
dî pey wê,
5 Tu ê hingê, ji Xwedê tirsiyar bûn çi ye seh bikî
û fêrbûna mezinahiya Xwedê çilo dibe tu ê
bizanî.

6 Ji ber ko Xwedê hikmet û şehrezayiyê dide û
ji devê Wî jîrî û zanîn derdikeve ;
7 Ew, dilpakan digihîne serfiraziyê, û mirovên
çak dihemîne.
8 U li ser reya rastiyê piyê wan dişedîne û şîvereya
peyayên xwe ên salih diparêze.
9 Welê, tu ê rastî û dilpakî, û heq û edaletê, û
riya qenc çi ye wê nas bikî.
10 Ji ber ko eqilmendî wê bikeve dilê te û zanin
li ber dilê te de, wê şîrîn bibe ;
11 Sîretine çak wê te bihemînin û hişê te, te ê bi-
parêze,
12 Da ko tu ne kevî ser riya mirovên xirab û ne
bî têkilî xelkên gotinxwar û rêwindakirî,
13 Yên ko ji reya rastiyê derketine û ketine xaçe-
reyine tarî,
14 Yên ko bi kirina xirabiyê dilxweş dibin, û bi
nefsa xwe a xwar di şahiyê de ne,
15 Yên ko riya wan xwar e, û dan û standina xwe
de jî ne rast in ;
16 Da ko tu ji destê jinên xerîba jî xelas bibî yên
ko gotinine dilrevîn dibêjin,
17 Jina ko dev ji mêrê xwe yê demên ciwaniyê
berdaye û gotina ko Xwedê pê her diwan girê-
dayî bû, ji bîra kiriye ;

18 Mala wê jinkê ber bi mirinê ve xwîl dibe û
gavên di wê, wê digihîne kortala miriyan.
19 Ji yên ko ber bi wê jinkê ve diçin yek jî ve-
nagere ve, û êdî ni kare bide ser riya xelas û
jiyinê.
20 Xwe ragire, da ko tu jî li ser reya mirovên
çak bimeşî û ji reya pakdilan dernekevî.
21 Ji ber ko mirovên rast li welêt rûnin û yên dil-
pak lê bimînin ;
22 Lêbelê, yên xirab ji rûyê erdê dê bêne qelan-
din û yên bêbext wê bêne edimandin.

## Bir 3

Kurê min, qanûnên min ji bîra me ke û pen-
dên min, bila di dilê te de cih bigirin ;
2 Ew ê ji te re jiyîneke dirêj, saline xweş û se-
lametiyê bidin.
3 Bila, qencî û dilrastî dûrî te me kevin, tu wan
bi stoyê xwe ve girêbide, wan li ser depê dilê
te binivisîne.
4 Wilo hişê te wê bibe saxelem û tu ê bibî dela-
lê Xwedê û yê dilên xelkê.
5 Bi hemî xurtiya dilê xwe, xwe bispêre Xwedê
û pişta xwe bi eqilmendiya xwe me şidîne ;

6 Her û her Xwedê bîne bîra xwe, ewê reya te
fîrehtir bike.
7 Di pêşiya çavê xwe dê, xwe bi eqilmendiya xwe
me nepixîne; ji Xwedê bitirse û dev ji xira-
biyê berde.
8 Pê gurçikên te bijûn û hestiyên te çalak bibin.
9 Bi mal û zadê xwe ê nûgihayî qedrê Xwedê bi-
gire :
10 Hingi, enbarên te wê bibin tejî zad û dexil û
denên te tejî şerab.
11 Kurê min, tekdîrên Xwedê kêm me bîne û ji
êşandina di Wî dilteng me be ;
12 Ji ber ko Xwedê weke bav bi kurên xwe dikin,
peyayên ko hejî wan dike diêşîne.
13 Serbilind e mirovê ko gihaye kikmet û şehre-
zayiyê û yê ko bijîr e....
14 Tiştê ko wî pê kar kiriye ji zîv û peran çêtir e,
û feyda ko jê tê ji ya zêran hêjatir e ;
15 Ew, ji mirariyan girantir e û qîmeta wê ji her
tiştên bibeha mezintir e.
16 Di aliyê wi ê rastê de jiyîneke dirêj û yê çepê
de dewlemendî û serfirazî hene.
17 Reyên ko di pêşiya wî de ne, yên xweşiyê ne û
hemî şivereyên di wî têr tenahî û selamet in.
18 Ew, ji bona yên ko wê digirin dara jiyînê ye,

û yên ko wê xurt digirin bi çiqasî bextiyar in.
19 Ji ber ko Xwedê hîmê dinyayê bi hikmet û şehrezayiyê daniye û bi eqilmendiyê ezmanan şidandine :
20 Bi hikmeta wî devên kûrahiyan vebûne û ji ewran xunav diniqute.
21 Kurê min, bila ev tiştên he, li pêş çavên te bimînin tu pê bîrewer û bextiyar bibî.
22 Ew ê bibin jiyîna giyanê te û zînetên stoyê te.
23 Tu pê di reya xwe de bi ewleyî bimeşî û piyên te li tişteki na kevin.
24 Heke te xwe dirêj kir, tirs na keve dilê te û ko tu razayî xewa te wê bibe şirîn.
25 Êdî, bila tirsa te ne mîne, ne ji tometekê ji nişkan ve û ne jî, ji-êrîşa peyayên xirab;
26 Ji ber ko tu xwe bi Xwedê wê bisitirîni û ew ê lingê te ji kemînan biparêze .
27 Heke ji destê te tê, arîkariya hewcedaran bike û xwe jê me de paş.
28 Heke di destê te de heye, bide; û ji xelkê re me bêje îro here û sibe were û ezê bidim te..
29 Xirabiya kesê ko li ba te rûniştiye me xwaze û me de eqlê xwe.
30 Bê sebeb, li acizkirina kesê ko tu neçeyiya wî ne gihaye te, me gere.

31 Berberiya zorkeran me ke û me de ser şopa
wan.
32 Xwedê ji rêderketiyan dikerihe; lêbelê Ew he-
valê dilpaqijan e ;
33 Laneta Xwedê di mala peyayên xirab de ye, lê
Ew rehma xwe digihîne mala pakdilan ;
34 Xwedê tevza xw bi henekkeran wê bike ; lê Ew
ji comerdiya xwe dide belengazan ;
35 Para eqilmendan serfirazî ye, û ya ehmeqan
şermisarî .

## Bir 4

Bibihîsin, kurên min, pendên bavên xwe ; û ta
ko fêrî hikmet û zamînê bibin, bala xwe ; bidinê
2 Ez şîretine qenc didim we, dev ji pendên min
bermedin.
3 Ez kurê bavê xwe bûm û kûrê deya xwe ê bi -
tenê û ê delal.
4 Wî ez hîn dikirim û digote min : berde, bila
gotinên min bikevin dilê te, bide pey şîretên
min û tu ê berxurdar bibî.
5 Bibe xwediyê zanîn û eqilmendiyê ; gotinên
devê min ji bîra me ke û rûyê xwe ji wan
bamede.

6 Dev ji pendên min bermede, ew ê te bihemînin;
hejî wan bike ew ê te bipaêzin
7 Ev e destpêka şehrezayiyê: hikmet û zanînê
bikesibîne û bila eqilmendî li ber dilê te, ji her
tiştî şîrîntir bibe.
8 Tu wan bilind bigire; ew ê qedrê te bilind bikin
û heke te ew himbêz kir, ew ê te bigihînin
serfiraziyê;
9 Ew, taceke çeleng wê deyne ser serê te û pê
eniya te zînetdar bike.
10 Bibihîse, kurê min. gotinên min bide hişê xwe,
pê salên jiyîna te pir û bêtir bibin.
11 Ez dikim reya eqilmendiyê pêş te bikim, ez di-
kim te bigihînim şîvereyên rastiyê.
12 Da ko çaxa tu dîmeşî gavên xwe bi rastî bavêjî
û heke te baz da bi tu tiştî me kevî.
13 Şîretên min xweş bigire, dest ji wan bermede,
wan biparêze ji ber ko ew in jiyîna te.
14 Me de ser xaçereyên mirovên bêkêr û me keve
ser reya peyayên xirab.
15 Berde, bila ew tê de bimeşin, lê tu jê dûr keve
û wêdetir here.
16 Ji ber ko wan heke xirabî ne kirin, ni karin
razin û heke peyayek ne xistine erdê xew ji
çavê wan direve;

17 Ew, nanê xirabiyê nixwin û şeraba zorkeriyê vedixwin .
18 Lê, şîvereya dilpakan mîna ronahiyê dibiriqe û rewşa wê heta nîvê rojê her û her bêtir dibe.
19 Lê, reya mirovên xirab qey tarî ye, û ew ni za - nin diçin kû û bi çi tiştî wê bikevin .
20 Kurê min, bala xwe bide gotinên min, guh bide gotarên di min .
21 Ew, bila dûrî çavên te ne bin ; wan di kûra- hiya dilê xwe de biparêze .
22 Ew jiyîn e, ji bona yên ko ew peyda kirin ; û ji bona laşê wan xweşî û saxelemî ye'
23 Ji her tiştî bêtir guh bide dilê xwe, ji ber ko kaniyên jiyînê jê tên.
24 Durûtiyê ji xwe dûr xe û gotinên nemerd ji lêvên xwe bavêje.
25 Berde, bila çavên te rast bi rast li pêşiyê binê- rin û çermên di wan bikevin ber te.
26 Berde, bila piyên te bi serbestî pêş ve bikevin' bêşik wilo berve diçi ;
27 Ne ber bi aliyê rastê û ne jî ber bi aliyê çepê ve xwe xwîl me ke û piyê xwe ji xiraban bi guhêre.

Kurê min, bala xwe bide hikmet û şehreza-
yiya min, û guh bidêre pendên min;
2 Ta ko hînî şiretên qenc bibî û lêvên te zanînê
biparêzin.
3 Ji ber ko lêvên jinên xerîba weke dilopên hin-
givî şîrîn in û devezmanê wan ji nivîşkî nerm-
tir e;
4 Lê, di dawiyê de mîna micêwer tehl in, û weke
şûreki ecemî tûj in.
5 Piyên di wan ber bi kortala mirinê dadikevin
û gavên di wan digehînin gorinan.
6 Wê, reya jiyînê a rast winda kiriye, gavên di
wê sist in û nizane bi kû ve diçe.
7 U niho, kurên min, min bibihîsin û dest ji
gotinên devê min me kişînin.
8 Reya xwe jê dûr xe û nîzingî deriyê mala wê
me be;
9 Da ko şerefa xwe ji dest ne dî û salên jiyîna
te ne bin para zelamekî xedar;
10 Ta ko biyanî ji malê te xwe têr ne kin û fêkî-
yên xebata te ne bin para maleke xerîb;
11 Ta ko di dawiyê de, ji çûna mal û canê xwe
axîna me kişînî;

12 U me bêjî : çawan min rûyê xwe ji rêz û rê-
zikan bada û dest ji tenbîhan kişand ?
13 U çawan min guh ne da dengê seydayên xwe
û min bala xwe ne da ji yên ko dersa mi di-
gotin ?
14 Hindik ma bû ko di pêşiya xelk û peyan de, tê-
kilî her xirabiyê bibim.
15 Ava sehrinca xwe û ya ko ji bîra te derdikeve
vexwe.
16 Ma ava kaniya te dibe bikeve erdê xerîba û ya
cobarên te di nav kolan û gasinan de biherike ?
17 Ew, bila ya te be û ne ko biyanî jî bi te re jê
parekê bibin.
18 Bila kaniya te, ji te re pîrûz be û dilê xwe bi
jina çaxa xortaniya xwe şa bike :
19 Mîna şivinekê şîrîn û xezaleke çeleng guhanên
di wê, te her têr bikin û dilê te bi hevîniya di
wê her mest û serxweş be.
20 Kurê min, çire tu hejî jinikeke xerîb bikî û bi
maçkirina memikên jinikeke nenas dilşa bibî ?
21 Reyên ko mirov didin ser, di pêşiya çavên Xwe-
dê de ne û Xwedê li wan miqate dibe.
22 Mirovên xirab bi destê emelên xwe ên kirêt dê
bêne weqifandin û bi werîsên gunehên di xwe
dê bêne girtin.

23 Ew, ji tunebûna rêz û rêzikan wê bimire û ji tolaziya xwe a gir; gêj bibe û riya xwe winda bike.

## Bir 6

Kurê min, heke tu kefîlê cîranê xwe bûyî, heke te ji bona kesekê gotina xwe dayî,
2 Heke tu bi gotina devê xwe pêgirêdayî bûyî, an bi axaftina xwe hatiyî girêdan,
3 Cehda xwe bike, kurê min, û xwe xelas bike, ji ber ko tu ketiyî destê xelkê, lezê bi xwe de nav di wan de û stoyê xwe bifilitîne;
4 Bila xew ne keve çavê te û çavên te ne yin girtin;
5 Xwe serbest bike weke xezala ko ji lepê nêçîrvana xwe aza dike, mîna çûkê ko ji destê teyirvana xwe difilitine.
6 Here nik mûriyan, mirovê tiral, li rê û xebata wan binêre û bibe eqilmend.
7 Her çend jî mîr, sermiyan û serbendên wan nî ne,
8 Di havînê de xwarina xwe pêktînin û di dema bênderan de zadê xwe kom dikin.
9 Tiralo, heta kengê rakevî? Tu kengê ji xewa xwe hişyar bibî?

10 Erê, hinik din raze, gaveke dî biponije, bihneke din zendên xwe deyne ser hev û du, heta ko bikari bi xew biçî. . .

11 U belengazî weke peyayekî gerok bi ser te de wê bê û nêz û birçitî mîna şerûtekî wê dirêjî te bikin.

12 Mirovê xirab, mirovê bêkêr dimeşe û devê wî xwar e ;

13 Cavên xwe dişkînîne û bi pê û tiliyên xwe dipeyive ;

14 Di dilê wî de xirabî heye û qesda neçeyiyê dike û xelk bi destê wî pev diçin.

15 Ji lewre, helaket bi derbekê lê bikeve û ew bi lez dê bişkê û tu xelasiya wî nî ne.

16 Xwedê ji van şeş tiştan dixeyide û nifiran li yê heftan dike :

17 Çavên bel, zimanê derewîn, destê ko xwîna bêçareyan direjîne,

18 Dilê ko li bêbextiyê digere û piyên ko di qesda karên xirab de xwe dilezînin,

19 Şahidê zor y ê ko derewan dike û yê ko fesadiyê têxe di nav kek û biran.

20 Kurê min, bide pey emrên bavê xwe û dev ji pendên deya xwe bermede.

21 Ev bila di dilê te de cih bigirin û bi stoyê te

ve girêdayî bin.
22 Gava tu diçî ew ê rêberiya te bikin, gava tu radikevî ew ê te biparêzin û gava tu hişyar dibî ew ê bi te re baxêvin.
23 Ji ber ko tenbî fanûsek e, qanûn ronahiyek e, û tekdîrên terbiyekirinê reya jiyînê ye :
24 Ew ê, te ji jinên xirab biparêzin û ji zimanên wan ên şîrîn bisitirînin.
25 Bermede ko spehîtiya wê dilê te birevîne û me keve dava mujankên di wê.
26 Ji derdê qehbikekê mirov dibe hewcedarî nanê tisî, û jinikeke zinakar nêçîrvaniya giyanê mirovan ê delal dike.
27 Ma dibe ko mirov agir têxe koşa xwe û pê can û cilên wî ne şewitin ?
28 Ma kesek dikare bê ko piyên xwe bişewitîne, li ser agirê sor bimeşe ?
29 Halê mirovê ko nîzingî jina yekî bûye jî wilo ye, yê ko dest avêtiyê tu caran ji cezayê xelas na be.
30 Dizê ko ji birçîna didize bêsûç na yê hesibandin;
31 U heke hatiye girtin, bihayê tistê dizî bi heft qatan jê tête standin û bi ser ve hûr û mûrên mala di wî jî, ji dest diçin.

32 Lê yê ko bi jinikekê zinayê dike yekcar bêeql e,
û ji xwe yê ko dixwaze xwe winda bike, wilo
dike :
33 Helaket û şermisarî para wî ne, û ew êdî ji
rûreşiyê xelas na be.
34 Ji ber ko dexis mirovan diqehirîne û ew di
dema tolvekirinê de bêrehim dibin;
35 Ew, êdî li zêr û zîvan na nêre û bi çiqasî bê-
tir jî bikî; qîma xwe pê na yê ne, doz û dehwa
xwe dike.

## Bir 7

Kurê min, qedrê gotinên min bigire û bala xwe
bide pendên min .
2 Bide pey pendên min, tu pê berxurdar bibî û
pendên min bila bibin bîbokên çavên te.
3 Tu wan bi tiliyên xwe ve girêbide û wan li
ser depên dilê xwe binivîse.
4 Ji şehrezayiyê re bibêje : tu xwîşka min î, û
bila bîrewerî bibe hevala te,
5 Da ko tu ji jina xerîba bête parastin, ji jinike-
kê ko gotinên wê tamşîrin in.
6 Ez li pêşiya pencera mala xwe de bûm û min
jî derabê mêze dikir.

7 Di nav serseman de, der nav xortan, çavê min
bi lawikekî bêhiş ket.
8 Yê ko di kolanê re derbaz dibû, nizingî qun-
cika ko lê yek ji wan jinên xerîban sekinî bû
û rûyê xwe dida ber bi xaniyê wê ve û hêdî,
hêdî diçû ;
9 Êvar bû, dema hînguri, di nav şevê de, der nav
tarîtiyê.
10 U binêr ; jinikeke ko dilê wê têr zexel û mîna
qehbikan cil li xwe kirî bû, nîzingî lê kir.
11 Jinikeke devtejîgotin û riswa û ya ko piyên di
wê ni karin li mal bimînin ;
12 Bihnek di nav kûçe û kolanan de, gavek der
gasinan, û di nîzingî hemî guşeyan de çavnêriyê
dikir.
13 Wê ew girt, û maçî kir û bê ar jê re got :
14 Min nezrek kiri bû, û îro min ev anî cih.
15 Ji ber vê yekê, ez ji mal derketim û hatim pêr-
gîna te, ji bona dîtina rûyê te û min tu peyda
kirî.
16 Min textê xwe kok kir, bi mêzer û mexfûrên
Misrê yên çeleng ;
17 Min nivîna xwe bi od û zimûrs û darçînê bi-
hindar kir.
18 Were, em heta rojhelatî bi hevînê serxweş bi-

bin û di nav kêfxwêşiyê de, dilê xwe sar bikin.
19 Herwekî mêrê min ne li mal e û çûye derekî dûr.
20 Xurcikeke peran bi xwe re biriye, ne niho, lê ko heyva nû derket wê vegere mala xwe.
21 Wê bi gotinên xwe ew xapand û bi lêvên xwe ên tamşîrîn ew kişand.
22 Ji nişka ve lawik ket pey wê, mîna gayekî ko diçe şerjêkirinê, weke dînekî ko diçe êşandinê,
23 Heta çaxa ko tîrek di kezeba wî re derbaz bibe, mîna çûkekî ko xwe dawêje torê, û bê ko bi-
hese ko pê jiyîna xwe datîne.
24 U niho, kurên min, min bibihîsin û guh bidin gotinên devê min.
25 Bila, dilê te, meyildariya xaçereya jinikeke wilo me ke; li ser şopên di wê reya xwe winda me ke.
26 Zehf in yên ko bi destê wê brîndar bûne; ko-
mek e yên ko bi destê wê hatine xeniqandin.
27 Reya mirinê di mala wê re dibore û mirov jê dadikeve kortala miriyan.

## Bir 8

Ma eqilmendî ban na ke, û şehrezayî bi dengekî bilind na peyive?

2 Ew li ser rê û di nav kûçe û kolanan de rawes-
tiyaye ;
3 Li pêşiya dergehan, li devê bajêr ban dike û
dibêje :
4 Mirovino, ez banî we dikim, qîrqîra min ji bona
kurê insana ye.
5 Peyayên gêj, çavê xwe vekin, û yên bêhiş, hînî
eqilmendiyê bibin.
6 Guh bidin, ji ber ko tiştine mezin dikim bibê-
jim û lêvên min vedibin da ko dersa rastiyê
pêş we bikim.
7 Ji ber ko devê min divê rastiyê bêje û ji kufirê
xwe bide paş ;
8 Gotinên devê min hemî rast in, û di nav wan
de tiştekî kirêt û nedirist nî ne ;
9 Mana gotinên min ji bona eqilmendan vekiriye
û rast in ; ji bona yên ko zanîn seh kirine.
10 Qedrê pendên min ji zîv û peran çêtir bigirin
û bizanin ko zêrê hêjatir di zanînê de ye ;
11 Ji ber ko eqilmendî ji mirariyan hêjatir e, û
qîmeta wê ji her tiştên xwedîbiha girantir e.
12 Min, eqilmendî û şehrezayî ji xwe re kiriye
xênî û dizanim şîretine rind bidim.
13 Tirsa Xwedê, ji xirabiyê nefirîn e ; çavbelî û
pozbilindî reya neçeyiyê ye, ê ez neyarê devê

xwar û derewîn im.
14 Pend û zêrekî yên min in ; tevdîr û xurtî destê
min de ne.
15 Mîr bi min hikmê xwe dajon û hakim jî emrên
xwe yên li gora edaletê didin ;
16 Bi min sermiyan, mezin û hemî serekên cihanê
karê xwe digerînin.
17 Ez, hejî yên ko ji min hez dikin, dikim ; û yên
ko li min digerin min peyda dikin.
18 Dewlemendî û serfirazî li nik min in ; malên
payedar û edalet.
19 Fêkiyên di min ji zêrê zer çêtir in ; û hatinên
di min ji zîvê pak bikêrhatîtir in.
20 Ez li ser reya edaletê dimeşim ; li nav şîvereyên
rastiyê ;
21 Ji bona dayîna xweşiyê ji yên re ko hejî min
dikin û ji bona tejikirina gencîneyên di wan.
22 Xwedê di destpêkê de ez xuliqandim, ji çîre-
destiyên wî ên kevintir jî, berîtir û pêşdetir.
23 Ez hatime afirandin ji payedariyê û wêda, berî
xuliqandina erdê.
24 Ez za-me dema ko hêj tu kortal tu ne bû û tu
kaniyên têr av.
25 Beriya ko çiyan cihê xwe de qahim bibin û be-
riya ko gir hebûn ez hatime heyînê ;

26 Wî hêj erd û tiştên ko li ser wan e û destpêka
ax û çiyan ava ne kiri bû.
27 Gava wî ezmanan pêkdianî ez lê bûm, gava ko
li ser rûyê kortala xîzek dikişand ;
28 Çaxa ko Wî ewir li ezmanan dida sekinandin û
kaniyên kûrahiyan dixurtandin ;
29 Gava Wî sînorên behran datanî, ta ko avên di
wan derbazî qeraxên axê ne bin, û çaxa binya-
dên erdê qahim dikirin ;
30 Ez li ba wî hostekar bûm, min bihna Wî ve-
dikir û ez li ber dilê Wî şirîn bûm û min di
pêşiya wî de dileyist û ez pê şa dibûm ;
31 Ez li ser erdê Wî bihnvekirî dibûm û di nav
zaroyên insana de kêfa min dihat.
32 Nexwe, kurên min, guh bidin min ; bextiyar in
yên ko didin ser reya min. . .
33 Bibihîsin, fêrî pendên min bibin da ko bîrewer
bibin û wan ma vêjin piştguhê xwe.
31 Bextiyar e mirovê ko min dibihîse, û hero çav-
nêriya deriyê mala min dike û lê nobetdar e. .
35 Lewma, yê ko min peyda dike, jiyînê peyda
dike û digehe dilovaniya Xwedê.
36 Lê yê ko bi min kêmaniyê dike, canê xwe diê-
şîne ; û heçî yên ko ji min dinefirin, hejî mi-
rinê dikin.

Eqilmendî mala xwe ava kiriye û heft stûnên xwe şeh kiriye.
2 Qurbana xwe şerjêkiriye, şeraba xwe aniye pêş û sifra xwe daniye.
3 Navmaliya xwe rêkiriye, ew di cihên bajêr ên bilind de ban dikin :
4 Yê ko bodile ye bila bê vir... Ew ji yên sersem re dibêje ;
5 Werin, ji nanê min bixwin, û ji şeraba ko hatiye danîn vexwin ;
6 Dev ji ehmeqiyê berdin û honê tama jiyînê wê bizanin ; û li ser reya hişyariyê bimeşin ...
7 Yê ko dixwaze tevzakeran fêr bike şermisar dibe û yê ko dildike mirovekî xirab çak bike, pê kêmqedir dibe.
8 . Tevzekeran me êşîne, ew ê nefiran li te bîke ; bîrewerekî biêşîne, ew ê hejî te bike.
9 Ji eqilmendekî re bide, ew ê hêj eqilmendtir bibe , dilpakekî hîn bike. ew ê hêj zanatir bibe.
10 Destpêka zanînê tirsa Xwedê ye, û zanîna ewliyan eqilmendî ye.
11 Bi min, rojên jiyîna te zehftir û salên emrê te bêtir bibin.

12 Heke tu eqilmend î, eqilmendî xwe yî; û heke
tu tevzaker î tu ê xwe bi xwe barê xwe hilgirî.
13 Dînîtî jinikeke devtejîgotin e, sersemek e û bi
tu tiştî ni zane.
14 Di devê deriyê mala xwe de, li ser kursiyekê
rûniştiye an di cihên şaristanî ên bilind de ra-
westiyaye :
15 Banî xelkê dike yên ko rast bi rast li ser reya
xwe dimeşin û dîbêje wan:
16 Yê ko ehmeq e, bila bê hir u ji serseman re
dibêje :
17 Avên diziyê şirîn in û nanê ko veşartî tête
xwarin tamdar e...
18 Lê, yê ko guhdide wê ni zane ko mirî lê kom
bûne û vexwendiyên di wê dibin ehlê nevala go-
rinan.

## Bir 10

### Methelokên Hezretê Silêman.

Kurikekî hişyar şabûnîya bavê xwe, lê lawikekî
sersem kedera dilê deya xwe ye.
2 Xezîneyên xirabiyê bikêr na yên, lê edalet ji mi-
rinê xelas dike.
Xwedê bernade ko canê pakdilekî ji birçîtiyê

biêşe, lê çavtengiya timakaran vedigerine ve.

4 Destê sist belengaz dike; lê destê xebatkeran dewlemendiyê tîne.

5 Yê ko havînê kom bike şehreza ye: lê yê ko di dema bênderan de radikeve rûyê bavê xwe reş dike.

6 Li ser serê dilpakan bereket heye; lê zorkerî rûyê xwedîyê xwe wê reş bike.

7 Navê dilpakan bi xêr têne gotin; lê navê peyayên xirab dirizin.

8 Yê ko ji dil hişyar e, bi ya pendan dike; lê yê ko bi lêvên xwe ni kare wê bikeve perişaniyê.

9 Yê ko rast dimeşe bi ewleyî diçe; lê yê ko dide ser reya xwar têtê nas kirin.

10 Yê ke çavan dişkînîne û bi çavan dileyize dibe sebeba xirabiyê; lê yê ko bi lêvên xwe ni kare wê bikeve perişaniyê.

11 Devê adilan kaniya jiyînê ye, lê zorkeri rûyê xwediyê xwe wê reş bike.

12 Kîn nav di pevçûnê dide; lê mihebet hemî sûçan vedişêre.

13 Eqilmendî li ser lêvên peyayên bijîr peyda dibe; lê ço ji bona pişta mirovên bêxeyr e.

14 Eqilmend zanînê kom dikin; lê devê sefîhan dikevin helaketê.

15 Malê dewlemendan kelatê wan e ; û perîşaniya feqîran, ji belengaziya wan e.

16 Malê pakdilan ji bona debara jiyînê ye ; û yê xiraban ji bona kirina gunehan.

17 Yê ko bi ya pendan dike xwe dide reya jiyînê ; lê yê ko guhnade tenbîhan, reya xwe şaş dike.

18 Lêvên derewîn kînê vedişêrin û yê ko paşgotiniyê dike sersemek e.

19 Li cihê ko pir gotin heye, tê de guneh jî heye ; lê yê ko lêvên xwe digire şehreza ye.

20 Zimanê dilpakan zîvekî bijarte ye ; lê dilê bêkêran kêmeyar e.

21 Gotinên eqilmendan rêber i ya zehf mirovan dikin ; û bodile ji tunebûna eqlan dimirin.

22 Rehma Xwedê bê renc û zehmet dewlemend dike.

23 Ji bona bêhişeki xirabî kirin, weke leyistokek e ; lê tevdîra mirovan eqilmendî ye.

24 Tiştê ko mirovê xirab jê ditirse tê serê wî ; û tiştên ko mirovên dilpak dixwazin dikeve destê wan.

25 Mîna bablisokekê mirovê xirab jî dibore, winda dibe ; lêbelê hîmên pakdilan payedar in.

26 Herwekî sihik li dirana û dû li çavan dike ; qasidê tiral jî li peyayê ko ew rêkiriye dike.

27 Tirsa Xwedê rojên jiyînê bêtir dikin; lê salên
mirovên xirab têne kurttir kirin.
28 Hêviya dilpakan wê bibe şabûniyek; lê ya mi-
rovên xirab tu ber na de.
29 Reya Xwedê ji bona dilpakan asêgehek e; lê ji
bona paleyên fesadiyê helaketek.
30 Piyê dilpakan li kevirekî jî ne keve; lê mirovên
xirab li welêt na mînin.
31 Devê dilpakan şehrezayiyê belav dikin, lê zima-
nê mirovê xwar dê bête birin.
32 Lêvên dilpakan hêja çi ye nas dikin; lê yên
mirovên xirab têrfesadî ne.

## Bir 11

Xwedê ji şehîna hîledar dikerihe, lê mîzaneke
rast li ber dilê Wî şîrîn e.
2 Li cihê ko pozbilindî heye, şermisarî jî heye -
lê eqilmendî para mirovên nefisbiçûk e.
3 Namûsa dilpakan rêberiya wan dike; lê hîle
yên bêbextan wan digihîne perîşaniyê.
4 Roja xezebê de, dewlemendî bikêr na yê; lê
dilpakî ji mirinê xelas dike.
5 Dilpakiya mirovên çak reya wan ava dike, lê
yê xirab pê xirabiya xwe winda bibin.

6 Edaleta dilpakan wan xelas dike ; lê mirovên xirab pê xirabiya xwe winda bibin .

7 Gava mirovê xirab dimire hêviya wî pûç dibe ; hêviya zorkeran jî wê pûç derkeve.

8 Dilpak ji tengiyê xelas bibin û mirovên xirab dê bikevin şûna wan.

9 Mirovê bêdîn bi zimanê xwe cîranê xwe têxe h?lakete ; lê mirovên dilpak bi zanînê jê xelas dibin

10 Ko dilpak bextiyar in, ehlê bajêr pê şa dibin û ko mirovên xirab perîşan dibin, ji xelkê qîrînên şahiyê radibin.

11 Bi bereketa mirovên qenc qedrê bajêr bilind bibe ; lê bi devên peyayên pîs şaristan dikeve zîvariyê.

12 Yê ko mirovên din heqîr dibîne sersemek e ; lê miroveki eqilmend deyin na ke.

13 Yê ko paşgotiniya xelkê dike, veşartiyan eşkere dike ; lê yê ko xwedî dilekî pak e, nependiyan li cem xwe dihele.

14 Gava pend û debarine çak nî ne milet dikeve, felata miletekî di piraniya şîretkeran de ye.

15 Yê ko kefîl dibe, dikeve tengiyê ; lê yê ko xwe jê dide paş, ewle û rahetser e.

16 Jinikeke delal serbilind dibe; û mirovên xurt dewlemend dibin.
17 Mirovê baş qenciyê digihîne giyanê xwe; lê peyayê xedar canê xwe têxe ezabê.
18 Karê mirovê xirab ê derewîn e; lê yê ko tovê edaletê direşîne bi rastî kar dike.
19 Edalet digihîne jiyînê; lê yê ko dide pey xirabiyê mirinê peyda dike.
20 Xwedê ji mirovên dilxwar dikeribe; lê yên ko dilrast in li ber dilê Wî şirîn in.
21 Bê guman e ko mirovê xirab bê ceza na mîne, lê çêliyên dilpakan dê bêne xelas kirin.
22 Xelekekî zêr di pozê berazekê de; ev e jinikeke spehî lê bêhiş.
23 Daxwaza dilpakan bitenê qencî ye; lê peyayên nebaş çavnêriya xirabiyê dikin.
24 Hin belav dikin û hêj dewlemendtir dibin û hinên din destgirtî ne û herûher belengaztir dibin.
25 Canê comerd wê qelew bibe; yê ko avê dide jê re av dê bête dayin.
26 Yê ko bi qesda karekî zêde genimê xwe ji dest na de: xelk lanetan lê dikin; lê bereket digehe mirovê ko wî difiroşe.
27 Yê ko li qenciyê digere, qencî digehe wî; lê

yê ko li xirabiyê digere lê dikeve.
28 Yê ko pişta xwe bi dewlemendiyê xurt dike
wê perîşan bibe; lê mirovên dilpak mîna pê-
lên daran şîn dibin.
29 Yê ko rahetiya mala xwe direvîne, wê paleyiya
bê bike; û bêhiş dê bibin hêsîrên eqilmendan.
30 Fêkiyê dilpakan dareke jiyînê ye; û mirovên
şehreza delalê dilê xelkê ne.
31 Nexwe, heke mirovê dilpak divê li dinyayê
ezabê bibîne; gelo halê zalim û gunehkaran
wê çito bibe?

## Bir 12

Yê ko hejî rêz û rêzikan dike ji zanînê hez dike;
lê yê ko ji êşa fêrbûnê direve bêhişek e.
2 Mirovê qenc digehe dilovaniya Xwedê; lê miro-
vê xirab bi destê xwe mala xwe xira dike.
3 Mirov bi xirabiyê xurt na be, lê rayê dilpakan
tu cara nayê hejandin.
4 Jinekeke pakdamen tacê serê mêrê xwe ye; lê
ya xirab mîna edaba hestiyên di wî ne.
5 Fikr û ramanên pakdilan heq in; lê qesdên mi-
rovên xirab hîle ne.
6 Peyivên neçeyan kemîn in; ji bona rijandina

xwînê ; lê devê mirovên rast xelas û felat e.
7 Mirovên xirab dê bêne xistin erdê û winda bibin û xaniyê dilpakan weke xwe bimînin.
8 Hêjabûna mirovan li gora eqilmendiya wan e î lê yê dilfesad bêqedr in.
9 Çêtir e ko mirov halê xwe bizane û xulamekî wî hebe ; û ne ko xwe binepixîne û hewcedarî perçekekî nan be.
10 Mirovê dilpak çavê heywanê xwe dihemîne ; lê dilê mirovên neçak bixwe xedar in.
11 Yê ko erdê xwe cot dike têr nan dixwe ; lê yê ko dide pey karên pûç ne tu kes e.
12 Daxwaza mirovên xirab her xirabî ye ; lê rayê salihan ber xurdar dibe.
13 Mirovê nebaş dikeve dehfika gotinên xwe ên xirab ; lê yê dilpak xwe ji tengiyê xelas dike.
14 Bi fêkiyên dev û lêvan zehf qencî digehe mirovan û kedê her destekî li gora xebata wî ye.
15 Bodile reya xwe rast dihesibîne ; lê ko guhdide şiretan bîrewer e.
16 Bêhiş erna xwe di cih de xuyanî dike ; lê yê ko heqaretekê vedişêre eqilmend e.
17 Yê rastdil rastiyê bi serbestiyê dibêje ; şahidê derewîn bi gotina xwe xelkê dixapîne.
18 Yê ko bêtebat dipeyive mîna şûrekî brîndar

dike ; lê zimanê eqilmendan dermanê dilan e.
19 Devê rastbêj her payedar e ; lê jiyîna zimanê derewîn kurt e.
20 Hîlebazî di dilê mirovên xirab de ye, yên ko neçeyiyê didin eqlê xwe ; û şabûnî para mirova ye ko pendê lihevhatinê didin.
21 Tu xirabî na gihe pakdilan ; lê serê mirovên nerind ji belayê xelas na bin.
22 Xwedê ji devên derewîn dikeribe ; lê yên ko rastiyê dikin dilovaniya Wî de ne.
23 Mirovê eqilmend şehrezayiya xwe vedişêre ; lê dîn dînîtiya xwe pêş xelkê didin.
24 Destê xebatker sermiyaniyê wê bike ; lê para destê tiral xulamîtî ye.
25 Derdê dilan mirovan dihelikînin, lê gotineke xweş şa dike.
26 Mirovê baş rêke çak şanî hevalê xwe dike ; lê reya neçeyan wan şaş dike.
27 Mirovê tiral nêçîra xwe jî na qelîne ; lê xezîneya mirovan ya hêja xwe tevdan e.
28 Di reya rastiyê de jiyîn heye ; û li ser vê şivereyê de mirin nîne.

Bir 13

Kurikekî eqilmend guhdide pendên bavê xwe ; lê yê tevizker guh na de tekdîran.

2 Ji gotinên devê xwe ên rind mirov qenciyê dibîne; lê çavê nerindan di xirabiyê de ye.
3 Yê ko bala xwe dide gotinên devê xwe, pê canê xwe diparêze, lê para devtejî û gotinlezan helaket e.
4 Mirovê tiral ji xwe re daxwazan dike, lê destvala ye, lê mirovê xebatker wê têr bibe.
5 Pakdil ji gotinên derewîn dinefirin; mirovên xirab xwe pê pîs dikin û şermisar dibin.
6 Pakdilî bêsûçan diparêze; lê xirabî gunehkaran perîşan dike.
7 Hin belengaziya xwe de, dewlemend in; û hin dewlemendiya xwe de, belengaz in.
8 Mirov bi dewlemendiya xwe dikare canê xwe xelas bike; lê mirovê belengaz guh na de tekdîran.
9 Çiraya pakdilan di şewq ronî dide; lê fanûsê mirovên xirab ditemire.
10 Di nav nefismezinan de her xirûcir e; lêbelê eqilmendî para yên e ko guh didin şîretan.
11 Malê bê rê komkirî her wê kêmtir bibe; lê karê xebatê hin bi hin bêtir dibe.
12 Bi hêviya ko na çe serî û bi şunda dimîne dil têşe; lê ko tiştê dilxwestî kete dest; ev dareke jiyînê ye.

13 Yê ko guh na de gotinan xwe davêje-xirabiyê; lê yê ko qedrê pendan digire qenciyê dibîne.
14 Dersa eqilmendan kaniyeke jiyînê ye; û mirov xwe pê ji kemînên mirinê xelas dike.
15 Hişeke şehreza xwediyê xwe çeleng dike; lê re-ya peyayên bêbext asê ye.
16 Miroveki bîrewer her tiştî bi tedbîr çêdike; lê peyayên bêhis bêeqliya xwe pêş xelkê dikin.
17 Qasidekî xirab dikeve perîşaniyê; lê yê çak dermana tîne.
18 Yê ko guh na de şîretan para wî belengazî û perîşanî ye; û yê ko bala xwe dide ders û tek-dîran digehe serbilindahiyê.
19 Dilxwaza çêbuyî li dil şîrîn e; lê ji xirabiyê durçûn bêhişan dikehirîne.
20 Yê ko diçe ba eqilmendan dibe eqilmend; lê yê ko hevaltiya dînan dike dikeve perîşaniyê.
21 Helaket dide pey gunehkaran; lê bextiyari wê bibe para pakdilan.
22 Mirovê çak mîratê dihêle law û neviyên xwe; lê dewlemendiya gunehkaran dê bibin para pakdilan.
23 Zeviyên belengazan dibin têr zad û dexl; lê hin, ji ber emelên xwe ên neheq perîşan dibin.
24 Yê ko kurê xwe na êşîne wî na hebîne; yê ko

dixwaze lawê xwe bikenîne wî diêşîne.
25 Dilpak ev e ko çavê wî têr dibe; zikê peyayên
xirab têrbûn çi ye nas na ke.

## Bir 14

Jinên bîrewer mala xwe ava dikin; lê jinên xi-
rab xwe bi xwe mala xwe hildiweşînin.
2 Yê ko li ser reya rastiyê dimeşe tirsiyarê Xu-
dayê xwe ye; lê yê ko dikeve ser reya xwar
Wî kêm dibîne.
3 Heçî dîn bi pozbilindî xeber didin; lê yê eqil-
mend devê xwe digirin.
4 Li cihê ko ga nî ne afir paqij dimîne; lê zadê
baş bi xurtiya gê çêdibe.
5 Şahidê rast derewan na ke; lê şahidê zor de-
rewine bêar dibêje.
6 Tevizker li eqilmendiyê digere lê wê peyda na
ke; ji bona bîreweran têgehiştin rahet e.
7 Ji bêhişan dûr bikeve: tu ji wan hînî tu tiştî na
bî.
8 Şehrezayiya mirovekî zêrek ev e ko reya xwe
rast dibijêre; lê dînîtiya serseman hîlebaziya
wan e.

9 Dîn henekê xwe bi gunehan dikin ; heçî qencî û keremkarî di nav eqilmendan de rûniştiye.
10 Dil xem û kederên xwe nas dike û biyaniyek ni kare têkilî şabûniya wî bibe.
11 Mala nerindan dê bête hilweşandin ; lê holikê pakdilan ava dibe.
12 Carna reyek ji yekî re rast xuyanî dike ;lê heye: ko ev reya mirinê ye.
13 Di nav kênînê de jî dil dikare brîndar bibe; û şabûnî dikare bigehe xem û kederan.
14 Dilê xapandî têrî reya xwe a şaş dibe ; mirovê çak bi tiştê ko di wî de ye têr dibe.
15 Mirovê hişsivik bi her tiştê ko dibihîse baweriya xwe tîne ; lê yê hişyar bala xwe dide gavên xwe.
16 Yekî eqilmend hisaban dike û ji xirabiyê xwe-dide paş û heçî bêhiş pozbilind e û ji xwe razî ye.
17 Ye ko zû dienire bêeqlîtiyê dike ; û ji hîlebazan xelk dixeyidin.
18 Dînîtî paro ehmeqa ye ; û mirovên bi tedbîr zanînê dikin zerzenga serê xwe.
19 Peyayên xirab di pêşiya mirovên baş de xwe nizm dikin ; herwekî zelamên qesdxirab di pêşiya pakdilan de ...

20 Rûyê belengazekî ji hevalê wî re jî sar e; lê dostên dewlemendan zehf in.
21 Yê ko mirovên din kêmî xwe dibîne guneheke dike; lê bextiyar e mirovê ko dilê wî xema belengazan dikişîne.
22 Ma yên ko xirabiyê didin eqlê xwe reya xwe şaş na kin? Lê yên ko qenciyê didin eqlê xwe rastî û dilovaniyê bibînin.
23 Li cihê ko xebat heye qwît heye; lê gotinên beredayî digihînin zîvariyê.
24 Dewlemendî ji bona eqilmendan taceke; dînîtiya serseman her dînîtî ye.
25 Şahidê rast canê xelkê xelas dike; lê şahidê zor wan dixapîne.
26 Yê ko ji Xwedê ditirse di kelateke qaim de pal daye; û çêliyên di wî jî dê bêne hemandin.
27 Tirsa Xwedê kaniyeke jiyînê ye; û ew xelkê ji dava mirinê dide zivirandin paş.
28 Boşahiya miletekî serbilindahiya qral e; lê li welatê ko xelk lê kêm in Mîr perîşan dibe.
29 Yê ko di xeyda xwe de nerm û giran e, şehreza ye; lê yê ko tê de xwe dilezîne, ehmeqiya xwe şanî xelke dide.
30 Dilekî rast jiyîna bedenê ye; lê hesûdî di hestiyan de edabek e.
31 Mirovê ko belengazekî diêşîne, pê qedrê yê ko

wî xuliqandiye dişkînîne; lê yê ko dilê fe-
qîrekî xweş dike, pê qedrê Xwedê mezin digire.
32 Mirovê neçak bi destê xirabîya xwe tête xistin
erdê; lê bihna yê dilpak di mirinê de jî vedibe-
33 Di dilê bîreweran de eqilmendî pal dide: û
tiştê ko di dilê netukesan de ye xwe xuyanî
dike.
34 Edalet payeya nijadan bilind dike; lê guneh
malxirabiya xelkê ye.
35 Qenciya qral digehe xulamê xwe ê bitevdîr û
erna wî jî yên re ko rê didin şermisariyê.

## Bir 15

Bi bersîveke nerm erin disekine; lê bi gotineke
hişk xeyid germtir dibe.
2 Zimanê eqilmendiyê şîrîniyê dide zanînê; lê de
vê ehmeqan dînîtiyê belav dikin.
3 Çavê Xwedê li her derî ye, û Ew li mirovên
qenc û neqenc dinêre.
4 Zimanekî şîrîn dara jiyînê ye; lê zimanê dere-
wîn êşa dila ye.
5 Bodile rêz û rêzikên bavê xwe kêmî xwe dibî-
ne; lê yê ko guh dide pend û tekdîran, wê bî-
rewer bibe.

6 Di mala dilpakan de boşiyeke mezin heye; lê karê neçeyan têr zehmet e.

7 Lêvên eqilmendan zanînê belav dikin; lê dilê dînokan nerast e.

8 Xwedê ji qurbana nerindan dikerihe; lê hêviya dilpakan li ber dilê Wî şîrîn in.

9 Xwedê ji reya neçeyan dikerihe; lê hejî mirovan dike yên ko didin ser reya rastî û edaletê.

10 Yê ko ji rê derdikeve bi xurtî lête êşandin; lê yê ko pê qail na bin divê bimirin.

11 U ne dilê mirovan; lêbelê dojeh û kortala mirinê jê re vekirî ne.

12 Tevzaker ji pend û tekdîran direve û nîzingî eqilmendan na be.

13 Bi dilekî şa rû ronak dibe; lê gava dil hiznî ye can dişkê.

14 Dilekî hişyar li zanînê digere; lê devê serseman ji bêeqliyê hez dikin.

15 Hemî rojên bextreşekî ne baş in; lê dilekî razî dewleteke payedar e.

16 Hindik, lê bi tirsa Xwedê; çêtir e ji xezîneyeke bi teq û req a mezin.

17 Çêtir e xwarina firaxeke giya bi mihebet ji ya gayekî qelew, bi dexs û dilreşî.

18 Erno, rê dide pevçûnê; lê yê hêdîxezeb xelkê

li hev tîne.
19 Reya tiralan têr stirî ye; lê ya dilpakan rast û
biservehati ye.
20 Kurikekî aqil şahiya dilê bavê xwe ye: û mi-
rovekî nekes rûreşiya deya xwe ye.
21 Dînitî ji bona ehmeqan şabûniyek e; lê mi-
rovekî eqilmend dide ser reya rastiyê.
22 Li cihê ko şîret nî ne qesd û daxwaz pûç dibin;
lê ko şîretker lê ne; qesd û dilxwaz diçin serî.
23 Bersîveke xweş xwediyê xwe şa dike; û bi çi
qasî hêja ye gotina ko di reya xwe de hatiye
gotin.
24 Ji bona eqilmendan reya jiyînê ber bi jor ve-
diçe; û ew pê ji erdê mirinê yê ko li jêr e,
têne veqetandin.
25 Xwedê mala nefismezinan dê hilweşîne; lê sî-
norên jinebiyan qaim dike.
26 Xwedê ji fikr û ramanên xirab dikerihe; lê go-
tinên pak û delal jê re xweş tên.
27 Çavbirçî mala xwe têxe teşxelan. lê yê ko ji
diyariyan hez na ke: ew ê berxurdar bibe.
28 Dilê bîreweran dide eqlê xwe, çi divê bêje; lê
devê nekesan xirabiyê belav dikin.
29 Xwedê dûrî nekesan dibe; lê guh dide dirût û
diayê camêran.

30 Bi tiştê ko çav diecibîne dil şa dibe; û bi xe-
bereke xweş hestî zexim dibin.
31 Yê ko guh dide tenbî û tekdîrên jiyînê, di nav
eqilmendan de wê rûne.
32 Yê ko guh na de pend û tekdîrên jiyînê; xwîniyê
canê xwe ye: lê yê ko bala xwe dide wan dibe
zêrek,
33 Tirsa Xwedê hînî eqilmendiyê dike; û pey ne-
fispiçûkahiyê mezinahî tê.

## Bir 16

Mirov daxwazên xwe dide eqlê xwe; lê cihaba
ko ziman divê bidiyê, ji aliyê Xwedê ve ye.
2 Ji her yekî re reya wî xweş û pak dixuye; lê
yê ko canan têxe şihînê Xwedê ye.
3 Karên xwe bispêre Xwedê û daxwazên te çêdi-
bin.
4 Her tiştê ko Xwedê kiriye bi qesdekê ye; mi-
rovê xirab jî ji bona roja helaketê...
5 Xwedê ji dilê xirayî dienire û ew bê ceza na
mîne.
6 Bi bext û qencî fesadî tête veşartin û bi tirsa
Xwedê mirov ji xirabiyê xwe dide alikî.
7 Gava Xwedê ji reya yekî razî ye; dijminên di

wî jî jê dilxweş dibin.

8 Hindik bi rastî û pakdilî çêtir e, ji malê pir yê neheqiyê.

9 Mirov ji xwe re reyek dibijêre, lê yê ko rêberiyê dike Xwedê ye.

10 Hikmê Xwedê li ser lêvê qrala ye û Mîr divê li gora edaletê hikmê xwe bide.

11 Sihîn û çavikên di wê ên rast ji alî Xwedê ve ne: û hemî giranî jê ne.

12 Qralan ji xedr û nehekiyê xwe dikerihînin ji ber ko tac û text bi rastî û edaletê qaim dibin.

13 Qral divê ji gotinên rast û bi rê hez bike û divê axaftinên vekirî li ber dilê wî şirîn bin.

14 Erna Qral qasidê mirinê ye; lê mirovê şehreza wê dinermîne.

15 Roniya rûyê Qral xeyr û jiyîn e; û keremkariya wî weke baraneke biharê ye.

16 Fêrbûna eqilmendiyê ji zêrê zer hêjatir e; û bîrewerî ji zîvê pak çêtir e.

17 Ji xirabiyê dûrketin reya dilpaka ye û yê ko li ser reya xwe a rast dimîne canê xwe diparêze.

18 Pey nefsmeziniyê perîşanî tê û pey pozbilindiyê kambaxî...

19 Çêtir e ke mirov bi belengazan belengaz be û ne ko malê talanê bi nefsmezinan par bike.

20 Yê ko bala xwe dide gotina xwe qenciyê dibîne; û yê ko xwe dispêre Xwedê wê bextiyar bibe.

21 Ji mirovî re yê ko ji dil bîrewer e, eqilmend tête gotin; û şîrîniya zimên zanînê bêtir dike.

22 Têgehiştin ji xwediyê xwe re kaniya jiyînê ye lê zanîna serseman dînîtiyek e.

23 Dilê aqil devê xwe bi hisaban vedike û bêtirbûna zanîna di wî, li ser lêvên di wî xuyanî dibe.

24 Gotinên delal wek şanekî hingivî ne; ew ji can re şîrînî û ji hestiyan re saxî ne.

25 Hin reyekê dieccibînin; lê di dawîyê ew wan digihîne mirinê.

26 Yê ko dixebite ji bona xwe dixebite; ji ber ko devê wî nav di wî dide.

27 Mirovê xirab çala xirabiyê dikole û devê wî de agir dişewite.

28 Mirovê neçak rêdide pevçûnê; û yê ko paşgotiniyê dike hevalan ji hev dike.

29 Mirovê zorker hevalê xwe dixapîne û wî dide ser reya ne baş.

30 Yê ko çawê xwe digire tiştine xwar dide eqlê xwe û yê ko lêvên xwe gez dike xirabiyê pêk tîne.

31 Porên spî taca rûmetê ne; ew di reya edeletê

de, têne peyda kirin.
32 Yê ko di Xezebê de sebrê dide xwe, ji yê mêr-
xasekî zeximtir e; û yê ko bi mêraniya xwe
dikare ji yê ko şaristanan vedike çêtir e.
33 Mirov pişkê davêje dawa xwe; lê heçî qerar ji
bal Xwedê ve ye.

## Bir 17

Pariyeke nanê tisî bi rahetî; çêtir e ji xwarina
xaniyekî tejî goştî têrteşxele.
2 Xulamekî zêrek li ser kurê malê ê tiral axatiyê
dike û mîratê de dikeve nav biran û ji xwe re
parek hiltîne.
3 Zîv di dîzikê de: zêr di êtûnê de têne ceriban-
din; lê yê ko dilê mirovan diceribîne Xwedê
ye.
4 Mirovê xirab guh dide gotînen devê xirab; û
derewker bala xwe dide zimanê mifsidan.
5 Yê ko henekê xwe bi bêçareyan tîne; qedrê yê
ko, wî xuliqandiye dişkînîne; û yê ko bi perî-
şaniya yekî şa dibe bê ceza na mîne.
6 Nevî taca bapîran e; û bav serbilindahiya za-
roya ye.
7 Gotinine hêja li sersemekî na yên û gotinine

derewîn hêj bêtir li Mîra na yên.

8 Diyarî li ber çavê yên ko ew dibin weke gewherekî ye û diyarîdayî ber bi kîjan alî ve jî rûyê xwe bide aqil tête hesibandin.

9 Yê ko gunehên xelkê vedişêre li hevaltiyê digere; lê yê ko qala wan dike dostan dike dijmin.

10 Tekdîrek li bîrewerekî; ji sed çoyî ko mirov li ehmeqekî daye bêtir diêşîne.

11 Mirovê xirab li pevçûnan digere; lê qasideki xedar dê bête rêkirin pêşiya di wî.

12 Çêtir e ko mirov rastî hirçekê bê ya ko kutikên xwe winda kiriye û ne ko dînekî di dînîtiya wî de.

13 Yê ko di pêşiya qenciyê de xirabiyê dike; xirabî dev ji mala wî bernade.

14 Destpêka pevçûnê mîna berdana aveke xurt e; beriya ko pevçûn destpêbike dev jê biqere.

15 Xwedê ji mirovên ko ji pakdilan re dibên xirab û ji xiraban re dibên pakdil dikerihe.

16 Ma sersemê ko di destê wî de pere heye û dike pê eqilmendiyê bikire, bikêrî çi tê; ma ji xwe ne sersemek e.

17 Hevalê qenc her hejî hevalê xwe dike û di tengasiyê de weke brayek e.

18 Mirovê bêhisab bi gotinan, xwe girêdide û dibe kefîlê xelkê.

19 Yê ko ji pevçûnê hez dik, hejî gunehan dike, û yê ko deriyê xwe bilind dike, li perîşaniyê digere.

20 Yê ko dilxwar e tu cara qenciyê na bîne; û yê ko bi du zimana ye wê bikeve sefîliyê.

21 Ya ko dîneki aniye dinê, serê wê dê biêşe, û bavê dîneki kêfxweş na be.

22 Dilekî şa dermanekî çak e; lê canekî xemxwar hestiyan ziwa dike.

23 Mirovên xirab bi dizîka diyariya dibin û pê şîvereyên edaletê tevlihev dikin.

24 Eqilmendî di pêşiya mirovên hişyar de ye, lê çavê dîna li çep û rast dinêrin.

25 Kurekî bêhiş şîna bavê xwe ye û diltehliya deya xwe, ya ko ew aniye dinê.

26 Ne baş e ko ji salihan re hikmî cerîmê têle dayîn; û li camêran ji ber emelê wan ê rast bête xistin.

27 Yekî bijîr di gotina xwe de nerm e, û mirovekî aqilmend sergiran e.

28 Sersem bixwe heke devê xwe venekir aqil têle hesibandin, lê yê ko lêvên xwe digire mirovekî hişyar e.

Yê ko terkeserê dinyayê dibe, li daxwaza xwe
digere û ji her tiştê bi rê dienire.
2 Dînok ji eqilmendiyê hez na ke û tiştên ko di
dilê wî de ne dike pêşxelkê bike.
3 Gava mirovekî xirab tê derekê, pîsîtî, bêbextî,
kêmanî û şermisarî pev re tên.
4 Gotina devê camêran avine kûr in; û ji kani-
ya eqilmendiyê cobarine boş diherikin.
5 Ne rast e ko mirov seba xatirê peyayên xirab
heqê bêçare û pakdilan bişkînine.
6 Lêvên dînokan rê didin pevçûnê û devê wî nav
di lihevxistinekê dide.
7 Devê dînokekî xesaran digihîne wî û lêvên di
wî bixwe, kemînekê datîne pêşiya di wî.
8 Axaftinên peyayên ko paşgotiniya xelkê dikin
şîrîn tên guhdaran û dikevin kûrahiya zikên
wan.
9 Yê ko di xebata xwe de sistiyê dike, brayê wî
peyayî ye ko wê xebatê xira dike.
10 Navê Xwedê asegeheke qaim e; pakdil dike-
vinê û tê de pal didin.
11 Dewlemendî ji bona xwediyan kelateke asê ye
û ew bawer dikin qey bedenên di wê zehf bi-

lind in.
12 Berî helaketê mirov pozbilind dibe; û mirov beriya ko bigehe serfiraziyê divê barê xem û xebatê hilgire.
13 Yê ko beriya ko bibihîse li pirsan vedigerîne, dînîtiyekê dike û pê şermisar dibe.
14 Di nesaxiyê de dilqewînî pişta mirova xurt dike; lê kî dikare yekî dilşikestî ji erdê hilîne.
15 Dilekî bijîr hînî zanînê dibe û guhê eqilmendan li zanînê ye.
16 Diyarî reya mirovan fireh dike û wan tîne pêşiya mezinan.
17 Yê ko ê pêşîn dipeyive xwedîheq xuyanî dibe, lê ko dawadarê din hat rastî li kû ye eşkere dibe.
18 Bi pişkan doz û dehwa diqedin û pê di nav mezinan de qerar tête dayîn.
19 Pevçûna bira ı zehmet e, ji kelatekê asêtir e û ji qiflên qesran xurttir e.
20 Mirov ji fêkiyên devê xwe zikê xwe tejî dike; û ji hatinên lêvên xwe têr dibe.
21 Mirin û jiyîn bi zimên ve girêdayî ne; û yê ko jê hez dikin ji fêkiyên di wî dê bixwin.
22 Yê ko jinikekê peyda dike bextiyariyê peyda dike û digehe rehm û dilovaniya Xwedê.

23 Feqîr bi nefisbişûkahiyê devê xwe vedike, dew-
lemend bi nefsmeziniyê lê vedigerîne.
24 Mana piraniya hevalan perîşanî ye, lê hin hene
ji brayekî camêrtir in.

## Lir 19

Çêtir e belengazê ko li ser reya xwe a rast diçe,
ji yê ko devxwar û dînokek e.
2 Tunebûna zanînê ji bona tu kesî ne rind e; û
yê ko peyêu xwe dilezîne li gunehan dikeve.
3 Dînîtiya mirovekî reya wî şaş dike û pê dilê wî
li ber Xwedê asê dibe.
4 Dewlemendî zehf hevalan peyda dike, lê ji yekî
belengaz heval direvin.
5 Şahidê zor bê ceza na mîne; û yê ko derewan
dike na filite.
6 Xelk pesnê comerdan didin û hemî dostê wî
peyayî ne ko diyariyan dide.
7 Herweki bra ji brayê xwe ê belengaz dikerihin,
gelo hevalên di wî, jê bi çi qasî dûr diçin; be-
lengaz hêviyan ji wan dike, lê ew li kû ne.
8 Yê ko eqilmend bûye ji canê xwe hez dike; û
mirovê hişyar bextiyariyê peyda dike.
9 Şahidê zor bê ceza na mîne û yê ko derewan

dike wê perîşan bibê.
10 Ji bona dîna rojine xweş ne şayeste ne, hêj kêm-
tir ko xulam axatiya Mîrekan bikin.
11 Eqilmend di ernê de hêdi ne, û di qisûrên xel-
kê derbaz bûn serfiraziya wan e.
12 Erna Qralî weke erêna şêra ye, lê keremka-
riya wan mîna xunavan li ser serê giyan.
13 Kurikekî gêj belayê serê bavê xwe ye, û jini-
keke teşxelehebîn mîna dilopên sûlavekê ne.
14 Ji dê û bav mal û xanî dimînin, lê jinikeke eqil-
mend diyariya Xwedê ye.
15 Tiralî mirovan têxe xewnine giran, û canê bê-
hisab ji birçîna têşe.
16 Yê ko pendan diparêze, canê xwe diparêze;
lê yê ko bala xwe na de reya xwe, wê bimire.
17 Yê ko arîkariya belengazan dike, deyn daye
Xwedê; û Xwedê ji comerdiya xwe lê vêdige-
rîne.
18 Heta ko hêvî lê ye, kurê xwe hînî rêz û rêzi-
kan bike; lê li mirina wî me gere.
19 Ernoyên har xesarê bibînin; tu wî jê xelas bi-
kî jî; ew vedigerîn ve.
20 Pendan bibihîse û hînî zanînê bibe da ko di
jiyîna xwe a mayîn de eqilmend bibî.
21 Di dilê mirovan de zehf daxwaz hene; lê tiştê

ko dilxwaza Xwedê ye, pêk tê.
22 Delalî û hêjabûna mirovan qencdiliya wan e,
û belengazek ji derewkerekî çêtir e.
23 Tirsa Xwedê digihîne jiyînê û pê mirov bi şev
têr dibe û xirabî nîzingî lê na ke.
24 Tiral destê xwe li firaxê davêjin, lê na yênin
devê xwe.
25 Li qeşmer û tevzekeran xe, pê bodile wê aqil
bibin; lewman bike mirovên bijîr, ewê pê qe-
drê zanînê seh bikin.
26 Yê ko zorê dide bavê xwe û deya xwe der dike
kurikekî rûreş û bêbext e.
27 Heke pend û şîret, te ji qeydeyên zanînê dûr
têxin, dev ji wan berde.
28 Şahidekî bêhiş henekê xwe bi rastiyê dike, û
devê nekesan neheqiyê daqurtînin.
29 Ji bona tevzakeran ceza li ber dest in; û ço ji
bona pişta bêhişa ye.

## Bir 20

Şerab henekker e, vexwarinine xurt têr xirûcir
in, yên ko zehf jê vedixwin ne eqilmend in.
2 Heybeta Mîra mîna qirîna şêra ye, yê ko wî
dieniriîne; qesda canê xwe kiriye.
3 Xwe ji pevçûnê dan alîkî şerefmendî ye, lê

bêhiş hemî xwe davêjin teşxelan.

4 Tiral dibêje zivistan e û cot na ke ; û di wextê pa eyiyê de, li zadî digere û tu tişt peyda na ke.

5 Daxwaz di dilê mirovan de avine kûr in ; lê mirovên hişyar dizane jê bikişîne.

6 Piraniya xelkê xwe dipesinînin, lê gelo kî miroveki pak wê peyda bike.

7 Pakdil di reya xwe a rast de, rast dimeşe ; kurên di wî pişt wî çiqas bextiyar in.

8 Mîrê ko li ser textê edaletê rûnişiye bi çavê xwe hemî xirabiyan radike.

9 Kî dikare bibêje : min dilê xwe paqij kiriye û ez ji gunehan safî bûme.

10 Du texlît şihîn û du texlît pîvan ; Xwedê ji her diwan dikerihe.

11 Ji kirinên zarokekî jî tête sehkirin, heke ew ê bibe miroveki rast û pak.

12 Guhê ko dibihîse û çavê ko dibîne ; her diwan jî Xwedê çêkiriye.

13 Ji xewê hez me ke, ta ko belengaz me bî ; çavê xwe veke tu ê têr nan bixwî.

14 Kiriyar dibêje : ne baş e, ne baş e ; lê ko kirî û çû kêtxweş dibe.

15 Pir zêr û mirarî hene ; lê devê zanayan tiştekî qîmetdar e.

16 Bistîne cilê peyayê ko dike bibe kefîl; û gerewan bibe ji mirovê ko dixwaze bibe kefîlê biyaniyekî.
17 Nanê ko bi hîlan kete dest, şîrîn tê devê xelkê; lê dawî devê wan tejî kevir bibin.
18 Daxwaz bi şîretan xurt dibe, ko şer dikî bi hisaban bike.
19 Yê ko paşgotiniya xelkê dike, nependiyên xelkê dide pêşçavan; têkilî peyayên ko lêvên xwe vedikin me be.
20 Çira mirovê ko lanetan li dê û bavê xwe dike; di tariya kwîr de wê bitemire.
21 Mîrata ko bi lez û bez hatiye xistin dest; di dawiyê de bê xeyr û bereket e.
22 Me bêje: ez ê xirabiya wî lê vegerînim; hêvîdarê Xudayê xwe bibe, Ew ê te jê xelas bike.
23 Xwedê ji kêşanekê bi du texlîtan dikerihe û mêzîneke ne rast, tiştekî kirêt e.
24 Xwedê gavên mirovan dide avêtin; lê gelo mirov dikare reya xwe seh bike.
25 Di kirina weqfê de xweş bide eqlê xwe, û piştî nezrê mitalan me ke.
26 Mîrekî eqilmend kêmbextan belavela dike, û çerxê di ser wan re diborîne.
28 Canê mirovan çira Xwedê ne; roniya wê kû-

rahiya bedenan kifş dikin.
28 Rastî û pakdilî Qralan diparêze û textê wan bi dilrehmî payedar dibin.
29 Xurtiya xortan rûspîtiya wan e; û porên spî zîneta pîra ye.
30 Êşa birîna ji bona mirovekî xirab dermanek e; herwekî tehliya lêdana ko diçe heta kûrahiya canî.

## Bir 21

Dilê Qralan di destê Xwedê de weke avên coya ne; Ew wî ber bi kîjan alî ve dixwaze vedigerîne.
2 Li gora mirovan her rêke wan rast e; lê yê ko dilan têxe mêzînê Xwedê ye.
3 Xwedê kirina heq û edaletê ji qurbana çêtir digire.
4 Çavên bel, dilekî xirayî û çira neçeyan gunehkarî ne.
5 Daxwazên mirovên baş digihînin bereket û boşahiyê; lê yê ko lezê li xwe dide dikeve tengasiyê.
6 Xezîneyên ko bi zimanekî derewîn hatine kom kirin xewn û xiyal in; û qasidên mirinê ne.

7 Zorkeriya neçeyan wan winda dike, ji ber ko dil na kin tiştê ko rast e çêkin.
8 Yê sûçdar dide ser xaçereyên xwar, lê mirovê bêsûç li ser reya rast dimeşe.
9 Çêtir e ko mirov di gûşa binê banî de rûne û ne ko di qesrekê de bi jinikeke teşxelehebîn.
10 Canê xiraban xirabiyê dixwazin û hevalê di wan li ber dilê wan, ne şîrîn in.
11 Gava qeşmerek têle êşandin, yê ehmeq pê aqil dibe; û heke dersa yekî hişyar hatiye dayîn, ew pê zana dibe.
12 Dilpak, gava xirabî bi ser mala nerindan de tê, jê ibretê distîne.
13 Yê ko di pêşiya hawara belengazan de guhê xwe digire (bila bizane): ew ê jî rojekê gazî bike û kes lê yenagerine.
14 Dana ko bi dizîka çêbûye ernê disekinîne û diyariya ko bi awakî veşartî hatiye dayîn xezeban nerm dike.
15 Ji bona adilan kirina edaletê xweşdiliyek e; lêbelê mirovên xirab pê diqehirin.
16 Yê ko ji reya eqilmendiyê derdikeve, dikeve civata miriyan.
17 Yê ko ji zewqê hez dike di destengiyê de dimîne û yê ko ji zeyt û şerabê hez dike dewle-

mend na be.
18 Mirovê xirab divê bibe fidaya dilpakan û yê bê-
bext yê camêran.
19 Çêtir e ko mirov di qeracan de biji û ne ko li
tenişta jinikeke rageş û teşxeleker.
20 Xezîneyine biqîmet û zeyt di mala eqilmendan
de ne; mirovên bêhiş wan daqurtînin.
21 Yê ko dide pey edalet û çakiyê, jiyîn, edalet û
serfiraziyê peyda dike.
22 Eqilmend dikeve şartisanê egîdan û zora yên
ko piştxurtiya wî bûn dibe.
23 Yê ko bala xwe dide zimanê xwe; canê xwe ji
êş û teşxelan diparêze.
24 Qeşmer û tevizker in ko nefismezin û ji xwe
razî ne, û bi erû û pozbilindî didin, dis înin.
25 Daxwaza tiralan wan dikuje, ji ber ko destê wan
na kin bixebitin.
26 Hin hene ro pê de dixwazin; lê yê pakdil bê-
minet dide.
27 Qurbana neçeyan tiştekî kirêt e; nemaze gava
têde niyetine nepak hene.
28 Şahidê derewîn wê perîşan bibe; lê mirovê ko
dizane bibihîse, her dê bipeyive.
29 Peyayê xirab bêar xwe dinepixîne; mirovê pak
dilnizm û sergiran e.

30 Di pêşiya Xwedê de eqilmendî, şîret û hişyarî
nî ne.
31 Hesp ji bona roja şerî hatiye cilûçek kirin; lê
serfirazî di destê Xwedê de ye.

## Bir 22

Navekî baş ji dewlemendiyeke mezin çêtir e;
rûmet ji zîv û zêran hêjatir e.
2 Dewlemend û belengaz divê tevlîhev bibin, her
du jî Xwedê afirandine.
3 Eqilmend helaketê dibîne û xwe vedişêre; lê
yê çavgirtî pêşve diçe û xesarê dibîne.
4 Hatinên pakdilî û tirsa Xwedê: jiyîn, serbilin-
dahî û dewlemendî ne.
5 Stirî û kemîn di reya mirovên xirab de ne; lê
yê ko ji canê xwe hez dike jê dûr diçe.
6 Zaroyan hêj di piçûkahiya wan de bidin ser
reya rastiyê; ko ew pîr bû jî, jê dernakeve.
7 Dewlemend axatiya belengazan dikin û yê ko
deyindar e xulamê qerddayiyê xwe ye.
8 Yê ko tovê xirabiyê direşîne xirabiyê diçine û
çoyê erna wî dişkê.
9 Mirovê ko nêrina wî delal e digehe rehmê;
ji ber ko ji nanê xwe dide belengazan.

10 Qeşmer û tevzeksran biqewirînin; pê pevçûn di-
qede ; û lihevxistin û qedirşkênandin disekine.
11 Hevalê mirovê ko ji dilpaqijiyê hez dike û li
ser lêvên wî gotinine delal hene, Qrale.
12 Cavên Xwedê zanînê dihemîne, lê gotinên bê-
bextan tevlîhev dike.
13 Tiral dibêje : ji ber ve şêr heye ; êz di nav
kûçe û kolanan de, we bême kuştin.
14 Devê jinekî xerîb çaleke kûr e, yê ko Xwedê jê
eniriye lê dikeve.
15 Dînîtî di dilê zaroyan de ye, lê çoya terbiyetê
ewê jê dûr têxe.
16 Yê ko belengazan têşîne da ko dewlemend bibe,
û ji bona piştxurtiya xwe jî, ji malê neheqiyê
dide mezinon, dawî dikeve zîvariyê
17 Guh bide gotinên eqilmendan bibihîse û za-
nîna min têxe dilê xwe.
18 Rind e ko ev tişt di dilê te de bimînin û li ser
lêvên te de bisekinin.
19 Da ko tu pişta xwe bi Xwedê xurt bukî, min
ev tişt bi te da zanîn.
20 Ma min ji bona te pend û şîret ne da nivîsan-
din ;
21 Ji bona ko tu hînî tiştine ewle û gotinine rast
bibî û ta ko pê bikarî li yê ko tu rêkiriye bi

peyivine rast vegerînî.
22 Malê belengazan, ji ber ko ew sist û bêçare ne
mestîne, û feqîran di devê deriyê xwe de me
êşîne ;
23 Ji ber ko Xwedê wê bibe dawadarê wan û canê
yên ko malê belengazan standine wê bistîne.
24 Meçe nik peyayên xeydê û bi zorkeran re me
meşe ;
25 Da ko xirabiya di wî jê me girî û xerabiya wî
me gehe canê te.
26 Têkilî peyayên ko xwe bi gotinan girêdidin û
kefiltiya yelkê dikin, me be.
27 Heke te ev kir û ketiyî tengiyê, nivîna te jî, ji
te dibin.
28 Derbazî sînorên kevin yên ko bav û kalên te
danîne me be.
29 Heke te, di xebata xwe de mirovekî şehreza
dît, bizane ko ew di tenişta Mîran de : wê bise-
kine ; ne li ba mirovên bêkêr .

## Bir 23

Heke tu bi yekî mezin re xwarin dixwî, bala
xwe bide tiştê ko li pêş te ye.
2 U heke tu zehf xwera yî hêrikek deyne qirika

xwe.
3 Minêkarî xwarinên wî ên tamzirav me be; ev xwarineke xapînok e.
4 Bi qesda dewlemend bûnê xwe me êşîne, dev jê berde.
5 Ma çavê xwe berdidî tiştên ko winda bibin? dewlemendî xwedî per û bask dibe û mîna qertelan ber bi ezmanan ve difire.
6 Nanê peyayên çavhar me xwe û mirêkarî xwarinên wî ên çak me be.
7 Ji ber ko xwarina wan mîna canê wan kirêt e; ji te re dibêje bixwe û vexwe; lê dilê wî bi te ne pak e.
8 Pariyên ko te xwariye tu ê vereşînî û tu gotinên xwe ên delal winda bikî.
9 Li guhê dînokan tiştek me bêje; ew şehrezayiya gotinên te kêmî xwe dibînin.
10 Derbazî sînorên kevin me be û me keve zeviyên sêviyan.
11 Ji ber ko sermiyanê wan xurt e; û ew ê doz û dehwa wan safî bike.
12 Dilê xwe veke pend û dersan; guhbide gotinên zanînê.
13 Dest ji terbiyeta zaroyan me kişîne, heke te lê çoyek da, ew pê na mire.

14 Tu bi çoyekî li wî dixî; lê pê dil û canê di wî
ji mirinê xelas dikî.
15 Kurê min, heke dilê te eqilmend e, pê dilê min
jî şa dibe.
16 Gava lêvên te rastiyê dibêjin pê bihna giyanê
min vedibe.
17 Dilê te bila gunehkaran me ecibîne; lêbelê tirsa
Xwedê tim û daîm di bîra te de be.
18 Pê dawiya te baş bibe û hêviya te pûç der-
nakeve.
19 Bibihîse, kurê min, eqilmend bibe û dilê xwe
bide aliyê rastiyê.
20 Têkilî peyayên ko pir şerabê vedixwin û zehf
goşt dixwin me be.
21 Ji ber ko serxweş û peyayên xwera belengaz
dibin û cilên mirovên xewhebîn çirandî ne.
22 Guh bide bavê xwe yê ko rê da jiyîna te û dema
pîrbûna wê de, qedrê deya xwe me şkînîne.
23 Rastiyê bikire lê wê mefiroşe; minêkarî eqil-
mendî, û pend û şîretan bibe.
24 Bavê mirovekî adil şa ye û yê ko dibe xwediyê
kurikekî eqilmend dilşa dibe.
25 Bila dê û bavê te kêfxweş bibin; û bila ya ko
tu aniye dinê di şabûniyê de be..
26 Kurê min, dilê xwe bide min; û bila çavên te

li ser reyên min bên û pê şa bibe.

27 Ji ber ko qehbik çaleke kûr e ; jîna biyaniyan bîreke tenge .

28 Wê mîna nijdevanekî kemînan datîne û pê di nav mirovan de bêbext pirtir dibin .

29 Axîn ji bona kê ? Weyla min ê ji bona kê ? Pevcûn ji bona kê ? Gilî û girîn ji bona kê ? Birînine bêhisad ji bona kê ? Çavine sor ji bona kê ?

30 Ji bona yên ko ji tenişta şûşeyên şerabê ranabin ; yên ko ji şerabên tevlîhevkirî digerin

13 Me nêre rengê şerabê ê sor , û di badînê de li şiklê wê ê çeleng û yê ko xweş tête vexwarin.

23 Di dawiyê de mîna marekî gez dike û mîna dûpişkekî vedîde :

33 Pê, cavên te li jinên biyaniyan binêrin û dilê te bi awakî fesadîn dê bipeyive.

43 Tu ê bibî mîna mirovê ko li ser rûyê behrê razayî ye, weke peyayê ko li ser serê dîreka gemiyekê raketiye .

35 Li min didin... laşê min na êşe... Li min xistine... ez pê na hesim... kengê ez ê ji xewa xwe hişyar bibim ?.... dixwazim ji nû ve vexwim.

Me de pey mirovên xirad û me be minêkarî hevaltiya wan ;
2 Ji ber ko kirina xirabiyê qesda dilê wan e, û lêvên wan neçeyiyê dibêjin.
3 Malek bi eqilmendî tête ava kirin û bi hişyarî têle parastin .
4 Bi şehrezayî mezelên xaniyan tejî hûr û mûrên hêja û qîmetdar dibin.
5 Mirovekî eqilmend xurt e ; û mirovekî hişyar zexm û xwedîqidret e.
6 Mirov divê bi hisab şer buke û li wê ko şîretker zehf in, serfirazî heye.
7 Ji bona dînokan eqilmendî gelek bilind e ; di civata hakiman de ew devê xwe venakin.
8 Ji peyayê re yê ko kirina xirabiyê dide eqlê xwe mizawir têle gotin .
9 Qesdekî xerab ; dînîtî û gunehkarîyek e, û xelk ji qeşmer û tevzekeran dikehirin .
10 Yê ko di tengiyê de sistiyê dike ne xurt e.
11 Peyayên ko dikin bikujin xelas bike û dest ji peyayên ko dikin şerjê bikin bermede...
12 Heke, te ev ne kir û got , xwezî, me ne dizanî ... Ma yê ko dilan diceribîne ev ne dîtiye ? Yê

ko canê te dipарêze pê ni zane? û li her kesî
li gora emelê wî venagerîne...
13 Bixwe, kurê min, hingivî; ji ber ko ev baş e;
hingiviyê daweriwandî; û ezmendevê te bila pê
şîrîn be.
14 U wilo jî eqilmendî ji bona canê te pak e; heke
te ew peyda kir, rojên te rewşen bibin û hêvi-
ya te pûç na be.
15 Di pêşiya devê deriyê dilpakan de; mîna miro-
vên pîs kemîna deymene: û cihên wêsihandina
wan xira me ke.
16 Ji ber ko miroveki dilpak heft caran dikeve û
dîsa radibe; lê peyê xiraban kûr dikevin perî-
şaniyê.
17 Ko dijminê te ket, bila dilê te pê şa ne be û
bi perîşaniya wî kêfxweş me be.
18 Bi tirsa ko Xwedê dikare bibîne û pê aciz bibe
û dev ji êşandina wî berde.
19 Ji ber mirovên ko xirabiyê dikin me enire;
û wan jî me ecibîne.
20 Ji ber ko yên xirabdestiyê bê hêvî ne û çira
wan zû ditemire.
21 Kurê min, ji Xwedê û ji qralan bitirse; û tê-
kilî teşxelekeran me be.

22 Ji ber ko bela bi derbekê bi ser wan de wê
bê û kî dizane bi çi awayî dê bêne êşandin.
23 Ev ji gotinên eqilmendan e. Ne baş e ko mirov
di hikimkirinê de guh bide meqamê dehwada-
ran.
24 Yê ko ji miroveki xirab re dibêje: tu adil î !:
Xelk jê nefiran dikin, milet lê lanetan dikin.
25 Lê yên ko wan diêşînin, têne pesinandin û bex-
tiyarî weke rehmetekê bi ser wan de tê.
36 Bersîveke rast mîna maçeke şirîn e.
27 Ji der ve karê xwe pêk bîne, zeviya xwe cot
bike; û dû wan, tu ê mala xwe ava bikî.
28 Bi eqilsivkî, di heqê xelkê de şehdetiyê me de;
ma tu dixwazî bi lêvên xwe xelkê bixapînî.
29 Me bêje: mîna ko wî bi min kiriye ez ê pê bi-
kim; li her kesê li gora emelê wî vegerînim.
30 Ez ji tenişta zeviya mirovê tiral û rezê dînoke-
kî derbaz bûme ;
31 Û binêr: erd têr stirî bû, muxeylan rûyê erdê
girti bûn û dîwar hilweşiyayî ;
32 Ko çavê min pê ket ; min bala xwe da û ez ji
dîtina xwe elimîm ;
33 Tu dixwazî hinik biponijî û hinik rakevî ; û zen-
dên xwe piçik deynî ser hev û du da ko razî...

34 U belengazî weke rêvingiyek bi ser te de wê
bê û hewcedarî, mîn a şerûtekî wê dirêjî te bike.

## Bir 25

Ev in hêj Methelokên Silêman, yê ko bi destê
peyayê Ezekiyas, Qralê Cuhistanê; hatine ber-
hev kirin.
2 Mezinahiya Xwedê veşartina tişta ye; lê me-
zinahiya qrala kifşkirina wan e.
3 Ezman bilind in, erd kûr e, û gesda dilê Qralan
na yên seh kirin.
4 Kefên zîvî jê hilîne; ji bona zîvker guldankek
derdikeve.
5 Ji tenişta Mîra mirovên xerab hilîne; pê textê
wî bi edaletê qaim dibe.
6 Di dîwana Mîran de me keve pêşiyê û cihê me-
zinan me gire.
7 Çetir e ko ji te re bête gotin: were hilkêşe jor;
û ne ko di pêşiya qral de qedrê te bête şkê-
nandin û tu wê bi çavê xwe bibînî.
8 Bê giranî me be dawadarê tiştekî; ma heke qe-
drê te hate şkênandin tu ê çi bikî.
9 Bi xelkê re doz û dawa xwe bike; lê veşartiya
mirovekî din eşkere me ke.

10 (Bide eqlê xwe), yê ko bihistiye heye ko lewman dike te û navê te dikare pê di nav xelkê de kêmqedir bibe.

11 Gotineke bi rê mîna sêveke zêrîn li ser firaxeke ziv e.

12 Tekdîrên miroveki hikmetdar ji bona guhên hişyar weke guhar û gerdeniyine zêrîn in.

13 Qasidekî rast ji bona mirovê ko wî dişîne, mîna honikbhiya berfê di meha paleyiyê de ye; pê rahetiya canê wî vedigere ve.

14 Yê ko pir dibêje û na yêne cih mîna ewr û bayên bê baran e.

15 Sebir erna qrala nerm dike, û zimanekî şîrîn hestiyan dişkînîne.

16 Ko te hingivî peyda kir li gora bihn û can bixwe lê zêde me ke, da ko venereşinî.

17 Pir meçe nik cîrana; dikare ji te têr bibe û dawî ji te dikerihe.

18 Şahidê derewîn ji bona xelkê mîna tîr û rim û şur e.

19 Di roja tengiyê de xwe bi bêbextekî girêdan weke diranekî şikestî an lingekî bêxeyr e.

20 Di rojeke sar de xwe tazî kirin û li ser sodayê de sihik çawa ye; mirovê ko di pêşiya dilekî brîndar de berdolaviyan dibêje wilo ye.

21 Heke dijminê te birçî ye jê re nan bide; heke

tihn e; avê deyn pêş wî.
22 Tu pê li ser serê wî agirine ser kom dikî û Xwedê li te wê vegerîne.
23 Bayê kur baranê tîne û yê ko bi dizîka paşgotiniya dike xelkê dixeyidîne.
24 Çêtir e ko mirov di binê barî de li gûşeyekê bimîne û bi jinikeke bedxû di malekê de rûmene.
25 Xebereke rind ji welatekî dûr; mîna aveke sar ji bona peyayekî westiyayî ye.
26 Mirovekî pak yê ko di pêşiya mirovekî xirab de dikeve; mîna kaniyeke şeylo û ava sûtaveke têkreçûyî ye.
27 Pir hingivî xwarin ne tiştekî qenc e; û li pey tiştine giran ketin, giraniya canî ye.
28 Mirovê ko bi nefsa xwe ni kare, weke bajarekî vekirî ê bê beden e.

## Bir 26

Berf li havînê, baran li dema paleyiyê û serfirazî ji bona bêhişekî li hev na yên.
2 Her wekî çûk difire û hechecok baz dide; laneta bê rê jî cih na gire.
3 Ji bona hespan qemçî, ji bona keran hevsar û ji bona dîna li pişta wî çoyek.

4 Li dînekî li gora dînîtiya wî vemegerîne; ji tirsa ko li ser wî ne çî.

5 Lê, li dînekî li gora şayestedariya wî vegerîne; da ko ew bawer ne ke ko aqil e.

6 Yê ko bi qasidekî bêeqil xeberan rêdike, lingê xwe dişkînîne; xirabiyê vedixwe.

7 Gotina eqilmendiyê di devê dîna de mîna govenda seqeta ye.

8 Yê ko qedrê dîna digire mîna mirov e ko kevirekî li berkaniyekê girêdide.

9 Di devê dînokekî de gotineke hêja, mîna destê serxweşekî de stirîyek e.

10 Mirovê ko bêhiş û gunehkaran di dora xwe de dicivîne; mîna tîravêjekî ye ko her kesî brîndar dike.

11 Dînê ko vedigere dînîtiya xwe mîna seyek e ko vereşandiya xwe dike devê xwe.

12 Heke te mirovek dît yê ko bawer dike eqilmend e; bizane ko mirov ji ehmeqekî dikare jê bêtir hêvidar be.

13 Tiral dibêje; li ser rê şêrek heye; di nav kûçe û kolanan de şêrek heye.

14 Her wekî derî li ser zerzînên xwe de diqeliqe, wilo jî mirovê tiral di textê xwe de ji alikî diqulipe alikî.

15 Tiral destê xwe dadike firaxê, lê jê re zehmet tê ko pariyê bîne devê xwe.
16 Tiral bawar dike qey ji heft peyayên ko bi eqilmendî li pirsan vedigerînin hişyartir e.
17 Mirovê ko seba pevçûnekê ko wî pê ne bendewar e dixeyide: mîna peyayekî ye ko seyekî ji guhê wî digire.
18 Dînokekî ko tîr û agir û mirinê davêje çawa ye;
19 Mirovê ko xelkê dixapîne û di pişt re dibêje ma min yarî ne dikir! Welî ye.
20 Ji tunebûna êzingan agir ditemire; di cihê ko tu kes paşgotiniyê na ke, pevçûn disekine.
21 Komir gurî, êzing agir û miroxê teşxelehebîn pevçûna germ dike.
22 Xeberên peyayên ko paşgotiniyê dikin mîna pariyine şîrîn in, diçin hindurê canî.
23 Lêvine germ û diteki sar û xirab, mîna şerbikeke zîv tamkirî.
24 Dijmin bi gotinan xwe diguhêre; lê di dilê xwe de xirab e;
25 Heke wî dengê xwe şîrîn kir, tu pê baweriya xwe mey ne; ji ber ko dilê wî de heft necisîtî heye.
26 Heke kîna xwe bi hîlebazîyê veşartiye jî, di civatê de, ew ê xwe kifş bike.
27 Yê ko çalek kola lê bikeve û kevir wê vegere

ser peyayê ko ew gêr kiriye.
28 Zimanê derewîn ji xesardîtiyên xwe dikeribe û devê ko bi derewan dipesinîne perîşaniyê pêk tîne.

## Bir 27

Bi sibe pesnê xwe me de; tu ni zanî sibe wê çilo bibe.
2 Berde bila yekî dîn pesnê te bide, û ne ko devê te; mirovekî biyanî û ne lêvên te bixwe.
3 Kevir giran e, û sêlak barek e; lê erna dînokan ji her diwan girantir e.
4 Xeyid bêrehm e, û erin mîna rabûna avê ye; lê kî dikare di pêşiya dexsê de bisekine.
5 Lewmeke vekirî ji hevaltiyeke veşartî çêtir e.
6 Brînên ko destbrayekî vekirine delîlê dostaniya wî ne; lê maçên dijminekî xapînok in.
7 Yê ko têr bûye pê li şaneyên hingiwî dike; lê yê ko birçî ye; tiştekî tehil ji tamşîrîn dibîne.
8 Mirovê ko ji bajarê xwe dûr ketiye; mîna çûkeke ko ji hêlîna xwe dûr firiyaye.
9 Dil bi bihn û bû şa dibe û şîretên hevalekî dilnerm şîrînin.
10 Dev ji hevalê xwe û yê bavê xwe bermede; û

gava di tengiyê de yî, me çe mala brayê xwe ; cîranekî nîzing ji brayekî dûr çêtir e.
11 Kurê min, aqil be, û pê dilê min şa bike û ez ê bikarim li peyayê ko qedrê min dişkînîne vegerînim.
12 Mirovê xwedîtedbîr xirabiyê dibîne û xwe vedişêre ; lê yê sersem pêş ve diçe û tête êşandin.
13 Cilên peyayê ko bûye kefîlê yekî jê bistîne, û ji mirovê ko kefîltiya xerîba dike gerewan bixwaze.
14 Heke yekî sibe zû bi dengekî bilind silavan li yekî dike ; weke lanetek tête hesibandin.
15 Sûlava avê di rojên baranê de û jinikeke bedxû mîna hev in.
16 Yê ko dixwaze wê bigire ; qey bê û zeytê dike bigire.
17 Hesin bi hesin têtê hesûn kirin ; wilo jî mirovek bi mirovekî.
18 Yê ko bala xwe dide dara hejîrê, jê wê bixwe û yê ko bala xwe dide serekê xwe dê biqedir bibe.
19 Herwekî siha rû li avê pêşberê rû ye ; wilo jî dilê mirova pêşberê hev in.
20 Gor û dojeh tucara tejî na bin ; welê jî çavê mirovan qet têr na bin.

21 Dizîk ji bona zîv e û êtûn ji bona zêr; qedrê
mirovekî jî li gora devên ko qala wî dikin eş-
kere dibe.
22 Heke te dîna mîna livekî xist çoniyekî û ew da
ber hodê; dîsa dînîtiya wan ji wan venaqete.
23 Pezên xwe yek bi yek nas bike û bala xwe bide
keriyê xwe.
24 Herwekî dewlemendî her û her dom na ke û
tacek tim ne payedar e.
25 Giyayê hişk tête berhev kirin, cêre ji nû ve he-
şîn dibe, û giyayên çiyan têne çinîn.
26 Berx cilên te didin; û nêri heqê zeviyekê tînin.
27 Şîrê te ê bizinan besî xwarina te, ya mala te û
ya navmaliyên te ye.

## Bir 28

Peyayê xirab baz dide; bê ko kes bikeve pey
wî; lê dilpak mîna şêrekî ciwan dilqewîn e.
2 Heke xelkê welatekî serxwerabûn sermiyan pir
dibin; lê di destê mirovekî zana û eqilmend
de welat payedar dibe.
3 Mirovekî belengaz yê ko zor dide bêçareyan,
mîna teyrokek e ko pê zad xira dibe.
4 Yê ko guh na de qanûn û nizaman pesnê mi-

rovên xirab dide; lê yên ko qedrê qanûnê digirin jê dixeyidin.
5 Yê ko xirabiyê dikin edalet çiye seh na kin; lê yê ko li Xwedê digerin bîrî her tiştî dibin.
6 Belengazê ko li ser reya xwe a rast dimeşe çêtir e ji dewlemendê ko dide ser reya xwar.
7 Yê ko bindestiya qanûn û nizaman dike kurikekî bijîr e; lê yê ko diçe nik sefîhan bavê xwe rûreş dike.
8 Yê ko bi faiz û mirabiheyê malê xwe bêtir dike; ji bona mirovê ko feqîrdost e, ew mal berhev kiriye.
9 Heke yekî rûyê xwe ba dide ta ko dengê qanûnê me bihîse; diayê wî jî mekrûh e.
10 Yê ko mirovên rast dike ji rê derîne; dikeve çala ko kolaye; û mirovên pak mîratxwerên bextiyariyê ne.
11 Dewlemend bawer dike ko eqilmend e; lê belengazê hişyar wî diceribîne.
12 Gava pakdil serfiraz dibin, şahî û şahînetek e; lê gava mirovên xirab serê xwe radikin; (bila) xelk xwe veşêrin.
13 Yê ko emelên xwe ên xirab inkar dike (divê bizane) ko jê na yê; lê yê ko pê mukir tê û toban dike, digehe rehmê.

14 Bextiyar e mirovê ko tirsa (Xwedê) her di di-
lê wî de ye; lê yê ko dilhişk dibe dikeve he-
laketê.
15 Peyayê xirab yê ko bûye sermiyanê miletekî
feqîr mîna şêrek e ko erênan dike û weke hir-
çekî birçî ye.
16 Qralê bêaqil hema xedariyê dike; lê yê ko ji
cavbirçîtiyê hez ne ke; hikmê xwe payedar dike.
17 Yê ko xwîniyê mirovekî ye heta gora xwe wê
baz bide; û (bila) kes wê me sekinêne.
18 Yê ko li ser reya bext û namûsê dimeşe dige-
he felatê; lê yê ko li ser reyân xwar digere ca-
rekê wê bikeve.
19 Yê ko erdê xwe cot dike têr nan dixwe; lê yê
ko dide pey xiyalên pûç têrî birçîtiyê dibe.
20 Mirovekî xwedîbext zehf qencî u bereketê di-
bîne; lê yê ko bi qesda dewlemendbûnê xwe
dilezîne, dawî dikeve belayekê.
21 Na be ko mirov guh bide xuyandariya xelkê;
û carna mirov ji bona perçeke nan gunehkar
dibe.
22 Yê ko ber bi dewlemendiyê xwe dilezîne û he-
sûd e: ni zane ko tengasî dikare bê pêrgîna wî.
23 Li dawiyê, di pêşçavê xelkê de, mirovê ko yekî
dièşîne çêtir e ji mirovê ko ji derewan jê re bi

dev şîrîn dike.
24 Yê ko malê dê û bavê xwe didize û dibêje ev ne tu guneh e; hevalê xiraba ye.
25 Nefsmezinî rêdide pevçûnê; lê yê ko xwe dispêre Xwedê kamiran dibe.
26 Yê ko pişta xwe bi dilê xwe dişidîne sersem e; lê yê ko li ser reya eqilmendiyê dimeşe digehe felatê.
27 Yê ko arîkariya belengazan dike na keve tengasiyê; lê yê ko (di pêşiya bêçareyan de) çav û guhê xwe digire dikeve laneta xelkê.
28 Gava mirovên xirab serê xwe radikin xelk xwe vedişêrin; lê gava ew winda dibin, pakdil zehf dibin.

## Bir 29

Yê ko şayesteyî êşandinê ye û serbaziyê dike bi derbekê wê bikeve perîşaniyê û kes ni kare wî xelas bike.
2 Gava eqilmend pir dibin; xelk di şahiyê de ne; lê gava mirovên xirab sermiyaniyê dikin xelk axîna tînin.
3 Yê ko ji eqilmendiyê hez dike bavê xwe kêfxweş dike; lê yê ko diçe cem qehbikan malê xwe

winda dike.
4 Mîr bi edaletê welatê xwe xurt dike ; lê yê ko diyariyan dibe erdê xwe xira dike.
5 Yê ko pesnê xelkê dide davek vedike pêşiya xwe.
6 Di gunehkariya mirovê xirab de davek heye ; lê yê adil serfiraz û dilxweş dibe.
7 Mirovê adil heqê belengazan nas dike ; lê yê xirab guh na didê.
8 Tevzeke bajara tevlîhev dikin ; lê eqilmend hêrsa xelkê hêdî dikin.
9 Ger eqilmendek bi yekî ehmeq lihevket, bienire jî, bi kene jî safî kirin zehmet e.
10 Mirovên devbixwîn ji eqilmendan nefiran dikin; lê mirovên rast wî dihemînin.
11 Bêeqil hemî erna xwe têxe pêş xelkê ; lê eqilmend devê xeyda xwe digire.
12 Heke sermiyanek guh dide derewan ; hemî xulamên di wî xirab in.
11 Bêlengaz û zalim rastî hevûdu tên ; ko çavê her diwan ronî kiriye Xwedê ye.
14 Textê Mîrê ko di nav belengazan de bi dilpakî hikim dike her payedar e.
15 Ço û tekdîr eqilmendiyê didin ; lê lawikê ko bi serê xwe hatiye hiştin rûyê deya xwe reş dike.

16 Gava mirovên xirab pir dibin guneh zehf dibe; lê eqilmend perîşaniya wan dê bibînin.

17 Kurê xwe biêşîne; ew ê rahetiyê bide te; û dilê te pê dê şa bibe.

18 Gava wehî na yê, xelk bê ser dibin; lê yên ko dev ji qanûn bernadin çiqas bextiyar in.

19 Dil, bi gotina, xwe na selihîne; seh bike jî guh nade.

20 Gava yekî dibînî ko di axaftinê de lezê dide xwe; bizane ko mirov jê bêtir dikare ji dinokekî hêvîdar bibe.

21 Xulamê ko mirov ji biçûkahiya wî ve pê re bi nermî da û stand, li dawiyê bawer dike ko kurê malê ye.

22 Mirovê erno rêdide pevçûnê û yên xeyidhebîn gelek gunehan dikin.

23 Nefsmezinî xwediyê xwe kêmqedir dike; lê yê ko nefsbiçuk e wê serbilind bibe.

24 Yê ko ji dizekî parek dibe dijminê giyanê xwe ye; wî didin ber sundê û dîsa rastiyê na bêje.

25 Tirsa mirovan ji wan re davek e; lê yê ko xwe dispêre Xwedê dê bête hemandin.

26 Zehf in yên ko li rûyê sermiyan digerin; lê yê ko heqê her yekî dide Xwedê ye.

27 Mirovê adil ji nerastan dikerihe û yê xirab ji
yên ko li ser reya rastiyê dimeşin dikerihin.

## Bir 30

Ev in gotinên Agur, kurê Jake; pend û peyi-
vên di wî. Min xwe westandiye Yezdanê min,
Xwe westendiye Yezdanê min; û dawî diviya
bû dev jê berdim.
2 Ji ber ko ez ji her kesî kêmeqiltir im, û hişê
mirovekî li ba min nîne.
3 Ez hînî eqilmendiyê ne bûme û ne giha me za-
nîna ewliyayan.
4 Kî hilkişiyaye ezmanan, û kî jê daketiye? Kê
dikarî bû bayî bigire? Kê di dawa xwe de av
kom kiriye? Kê şanî dawiya erdê daye? Navê
wî û navê kurê wî çi ye? Tu dizanî?
5 Hemî gotinên Yezdan hatine ceribandin. Yezdan
ji bona peyayên ko xwe spartine wî mirtalek e.
6 Tu gotin bi ser yên wî re zêde me ke; an
ne te dieşîne û tu derewîn derdikevî.
7 Ji te du tiştan dixwazim: hêvîya min bi şûnda
vemegerîne, beriya ko bimirim...
8 Durûtî û derewan ji min dûr bike; ne dewle-
mendî û ne jî belengaziyê bide min; bi tenê

nanê ko ez hewcedar im.
9 Ji tirsa ko di dewlemendiyê de, te inkar bikim
û bibêjim : Xwedê kî ye ? an di belengaziyê de
diziyê bikim, û zimandirêjiya navê Xwedeyê
xwe me kim.
10 Li ba sermiyan paşgotiniya xulamê wî me ke;
heye ko lanetan li te dike û tu pê sûçdar dibî.
11 Çêliyek heye lanet li bavê xwe dike; û qedrê
deya xwe na gire.
12 Çêliyek heye bawer dike ko paqij e; herçend jî
mirdariya xwe hêj ne şûştiye.
13 Çeliyek heye çavbel û pozbilind e.
14 Çêliyek heye diranên di wî şûr in, û hestîçene-
yên di wî kêrik in; ewê belengazên welêt û xel-
kê bêçare daqurtîne.
15 Du keçikên xwînmêja hene; bide, bide. Sê tişt
hene ko têr na bin û çar hene ko tu cara na
bêjin bes e.
16 Gorin, jina stewr, axa ko têra xwe av venexwa-
riye û agirê ko tu cara na bêje bes e.
17 Çavê ko henekê xwe bi bavê xwe dike û bin-
destiya deya xwe kirin jê re giran tê; qijikên
tîjavan wî dê biperitînin û qertelên ciwan wî
dê bixwin.
18 Sê tişt hene ko eqlê min na gihe di wan : no

çar in tiştên ko ez tê na gehim ;
19 Şopa evloyan li ezmanan, dewsa maran li ser
tehtan, şopa gemiyan li ser rûyê avê û dewsa
mêran li ba jinikeke ciwan.
20 Ev e reya jinikeke zinakar, dixwe ; devê xwe
ziwa dike û di pişt re dibêje : min tu xirabî ne
kiriye.
21 Sê tişt hene ko erdê dihejînin ; û çar tişt hene
ko erd ni kare wan hilgire :
22 Evdê ko bûyê sermiyan, û bodileyê ko têr nan
xwariye.
23 Jinikeke ne ecibandî ya ko dizewice ; û xadima
ko dibe mîratxwera stiya xwe.
24 Li rûyê erdê çar heywanên biçûk hene ; biçûk
lê gelek bijîr :
25 Mûrî, miletekî bê qiwet, di havînê de zadê xwe
kom dike.
26 Kevorşk, nijadekî nezexim ; lê mala xwe di nav
zinaran de çêdike.
27 Kulî, her çend jî qralê wan nîne ; hemî lek bi
lek bi nizam difirin.
28 Pîrhevok, ya ko bi destê xwe dixebite û di qes-
ra qralan de ye.
29 Sisê hene ko meşçeleng in ; û çar yên ko gav-
avêtina won spehî ye :

30 Şêr, egîdê heywanan, li ber tu kesî de xwe na
de paş ;
31 Hespê zîn û hevsar kirî, an nêrî û qral ; yê ko
kes pê ni kare.
32 Heke nefsmezinî nav di te dide û dikî dînîliye-
kê bikit û ger fikr û ramanine xirab di serê te
de ne ; destê xwe deyne ser devê xwe ;
33 Heke şîr hate keyandin û meyandin jê nivîşk çê-
dibe, heke difin xurt hatiye giwaştin jê xwîn tê;
û heke erin hate germ kirin pê pevçûn çêdibe.

## Bir 31

Ev in gotinên Qral Lemuel ; pendên ko deya
wî hînî wî kiri bûn.
2 Ez ê çi bêjime te kurê min ? Çi bêjime te kurê
canê min ? Çi bêjime te roniya çavên min ?
3 Xurtiya xwe me de jinan ; û me keve ser re-
yên ko Mîr têde perîşan dibin.
4 No, aral Lamuel. li qrala na yê ko şerabê ve-
xwin û ne jî li mîrekan tê, vexwarinine xurt.
5 Heye ko ew bi vexwarinê qanûn û nizama ji
bîra dikin ; û heqê bêçareyan dişkînînin ;
6 Vexwarinine xurt bidin mirovên ko di perîşani-
yê de ne ; û şerabê bidin peyayên dilşikestî ;

7 Da ko pê perîşaniya xwe ji bîra bikin û bextreşiya wan bila me yê pêş çavê wan.
8 Devê xwe veke ji bona mirovên lal û ji bona parastina heqê yên ko hat'ne ji bîra kirin.
9 Devê xwe veke û bi edelatê hikim bike û heqê bêçare û belengazan (ji erdê rake û) bide wan.
10 Kî dikare jinikeke pak peyda bike, ji mirariyan zehf hêjatir e.
11 Dilê mêrê wê pê amin dibe û karê di wî kêm na be.
12 Di hemî jiyîna wî de, wî na êşîne û qenciyê dike wî.
13 Hirî û kitan peyda dike û bi destên xwe bi kêfxweşî dixebite.
14 Mîna gemiyên bazirganiyê nanê xwe ji dûrahiyan tîne.
15 Beriya rojhelatî radibe û xwarinê dide xelkên malê û zadê xadimeyan...
16 Bala xwe dide zeviyekê û wê dikire û bi kedê destê xwe jê rêzek çêdike.
17 Piştiya xwe dişidîne û zendên xwe dixurtîne.
18 Dizane, tiştê ko kar kiriye qence; çira wê bi şev qet na temire.
19 Destên xwe datîne teşiyê û tiliyên wê dirêsin.
20 Arîkariya bêçareyan dike; û destê xwe dide

belengazan.

21 Ji bona xelkê mala xwe xema daketina berfê
na xwe, ji ber ko hemî ehlên malê xwedî du
deste cil in.

22 Ji xwe re mêzeran çêdike, cilên di wê ji hew-
rûşimê ergiwanî ne.

23 Mêrê wê di dergehan de nas e, gava bi rîspiyên
bajêr re rûdine.

24 Kirasan çêdike, û difiroşe û ji bazirganan re
re piştiyan dide firotin.

25 Xurtî û serfirazî cilên wê ne û li rojên pêşiyê
bi kenîna dinêre.

26 Devê xwe bi eqilmendiyê vedike û li ser zimanê
di wê pendîne şîrîn hene.

27 Li karên mala xwe miqate dibe û nanê tiraliyê
na xwe.

28 Kurên di wê radibin û dibên bextiyar e û mêrê
wê radibe û pesnê wê dide.

29 Zehf keçik hene ko pak in, lê tu ji hemiyan pa-
yebilindtir î.

30 Delalî xapinok e, û spehîtî winda dibe, divê
mirov pesnê wê jinkê bide za ko ji Xwedê tir-
siyar e.

31 Ji kedên destê wê bidin wê û bila di dergehên
bajêr de emel û kirinên di wê, pesnê wê bidin.

• DAR AL-KASHAFF • PRESS
BEIRUT • LEBANON